


Rustem Cûdî


Çîçek Botan


Alîşer Koçgirî

# Dilê min digirî

Kî dikare bibe Rustem, kî dikare bibe Elîşêr, kî dikare bibe Çîçek? Ew weke navê destanên cengaweriyê û di kêleka Promethaus de, bi kûç û berzehên Çiyayê Zagrosê ve zincîrkirî ne

**MEDENÎ FERHO**

Ez ê yekşema 9'ê Cotmehê bi duşemê ve, bi hefte, meh û salan ve girêbidim.

Da ku, di rojan de, di hefteyan de, di meh û salan de, navê Rustem Cûdî li asîmanê Kurdistanê binivîsim. Da ku bibe pelek ewrê baranê, bi bayê xerbî re baqên nefelê û gurzên indekoyê berhev bike.

Da ku, gerdena xizêmşora heyva li çardehan bixemilîne.

Bo bibe kulîlkên bi navê Alîşer Koçgirî û Çîçek Botan...

Bo ku ez bibim Botan, bibim Qendîl, bibim Serhed û Dêrsim, bibim bizavtina bayekî li ser hawara dayikên Kurdistanê.

Bo ez bibim gurzê destê zarokên kurd, li Amedê, li Mêrdîn û Batmanê, li Sêrt û Serêkaniyê, li Qamişlo û Kobanê û keviran biavêjim polîs û romiyên kujer.

Da ku bibim Bagok û li Binya Xetê bibim helbestek bê dawî û li tevahiya welat bibarim.

Hingî dem nikare bi min, nikare bi navê Rustemê min...

Nikare bi Eliyê min û nikare biçilmisîne, evîna Çîçeka Botanê. Ne top û tangên dijmin, ne balafirên tirk û Sedam dikarin Qendîl û Helepçeyê bişewitînin.

Li ser dezgehekî zêrîn ez ê navê lehengên dilê xwe binivîsim, li ser taqên çiyarêzan bi tîpên bizmarî û şibî-kirina zêrîn bikolim. Ez ê bibim çakûç...

Ez ê bibim sidan...

Ez ê bibim miqar û di destê hostayên kevirê Qatoro de li ser kevir û kûçan bibim nav û li ser avê, li ser axê, li ser asîmanê Kurdistanê û li ser mermerên cîhanê binivîsim… Êdî kes nikare ji bîr bike destanê wan û nikare bêje ez Rustem Cûdî me...

Na kes nikare bêje, ez Rustem im û li Cûdî destanê azadiyê dinivîsim. Kes nikare bêje ez Alîşer Koçgirî me, kes nikare bêje ez Çîçek Botan im.

Ew wek dilopên baranê, wek stêrkên li şînxaliya asîman, wek gotinên di rûpelên dîrokê de, wek pêlên çemê jiyanê ne… Kî dikare bibe Rustem, kî dikare bibe Elîşêr, kî dikare bibe Çîçek? Ew weke navê destanên cengaweriyê û di kêleka Promethaus de, bi kûç û berzehên Çiyayê Zagrosê ve zincîrkirî ne…

Wek xwedawendên sedsalê, ocaxa mirovahiyê bi agirê pîroz ronî dikin.

Rustem Cûdî navê demê ye…

Alîşer Koçgirî navê demê ye…


Çîçek Botan navê demê ye…

Kes nikare bibe nivîskarê vê dema bi cengaweriyên destanî hatiye xemilandin.

Belkî rêzek gotin, çend stêrk werin darvekirin û hemayilên zêrîn li hev bêne pêçan û wek nivîştokên pazîbendan bêne girêdan. Û çend dilopên baranê bibarînin. Û awzekê biqîrin.

Lê, tu nivîskar wê nikaribin navê di atlasê dilê min de hatiye nivîsandin bikdirînin. Ew navên ku li çar taqên Kurdistanê hatine kolan û bi dilopên xwîna xwe, bi parçeyên laşê xwe dirih û mayinên tixûban parçe kirine, tune kirine, zengil û naqosên azadiyê lêdane û bûne ronahiya heyva li çardehan… Kî dikare binivîse destanên bi xwînê hatine mohr kirin?

Roja gonê, Rustem Cûdî li Qendîl û Xînêra, li Xakurk û Zapê li hemberî asîmanê sotî kirî û li ser axa şewitî, li hemberî darên kizirî, li ber qeraxê ava jehrkirî, got : "Kurdistan êdî azad e. Azadî rûniştina di rojeva cîhanê de ye, ev navê qebûlkirinê ye. Êdî Kurdistan heye, nasnameya Kurdistanê heye û kurd jî xwedî îrade ne."



Ez û ew çûne Qamişlo, Tirbespiyê, li ser banekî di kêleka gundekî de rûniştin.

Me pişta xwe da Çiya û deştên Serê Kaniyê û heya bi Bagokê me hespên xwe bezandin.

Me stêrk ji asîmanê Amedê kom kirin û bi asîmanê Sêrtê, yê Hewlêrê ve daleqandin.

Me li hemberî goristanên kêlên şikestî çend stran gotin û me bi zimanekî nenas, got ; "çermê me kolan berîk çêkirin û xwê kirin. Bedena me gule kirin, parçe kirin, dîsa jî, em sonda azadiyê xera nakin, riya me ya azadiyê ye…"

Rustem Cûdî got, "êdî hêvî mezin e, kes nikare bêje cengawerên kurd bê nav in û Kurdistan bêxwedî ye. Xwîna me bû kilîda azadiyê."

Hingî strana Ferhat Tunç, "Uyyyyyy uyyyyy hawar" hate bîra min.

Dilopek rondik li ser mijgulên min peyda bû. Bêhna kizîra dilê min hat, dilopên xwîn niqutî ser kezeba min. Dilopa rondika min, hat û li ser kulîlkên berxwedanê û wek dengê naqosa banga hawarê olan veda. Dengê zengilê azadiyê û qîrîna cengaweriya Rustem Cûdî li çar aliyên cîhanê hate bihîstin.

Zengilên zarokan û pîpîkên gizîran li kolanên bajar û gundan bûne kevir...

Hingî, dengê spîkerê Radyoya Dengê Mezoptamya Serhildan hat û got: Zarokên Amedê bi keviran re diaxivin, bi keviran re radizin, tirsa xwe di berîka polîsên hov de, tirsa xwe di çavên polîsên har de, tirsa xwe di paşil û pêsîra polîsên dirinde de diqîrin û agirê dilê xwe li nav serûçavên panzerên polayî didin."

Ew zarokên Rustem Cûdî ne û hevokên cengê diqîrin.

Ew zarokên Elîşêr Koçgirî ne, çakûçê li ser sidan in.

Ew zarokên Çîçek Botan in, dengê herka dîrokê di mista xwe de haveyn dikin.

Îro dilekî min çilmisî, yek ponijî. Dîsa jî sê gulên basimbarî di mista cengawerên min de kat dan; zengilê valahiya demê lê da û hawara 9'ê Cotmehê daket...

Sal dirêj bûn, bihar winda bû û lingê min riya xwe şaş kirin. Mêjiyê min dem û heyam tevlihev kirin. Roj bûne sal, sal bûne sedsal… Ez ketim xewneke şityar û bêyî ez bigirîm, min dilê xwe sotî kir, kezeba xwe dax da...

Di xewê de ez birîndar bûm û ez ne ez bûm. Dil û mêjiyê bûne stranên dilojarê lorandin... Piştre, dilojarê bûne destan û helbest tevli çemê dîrokê bû.

Di vê dema kuştî de, min xwe nasnekir. Kuştinek nû, birîndariyek nû, windahiyek nû diafirîne. Dixwazim ji nû bibim û nav li xwe bikim û di jiyana nû de, wek Rustem Cûdî got, "gerîla nave jiyana nû ye" ez jî bibim gerîlayek.

Gerîla heyamên vala didagirin, bi navên nû, di jiyana nû de, jiyaneke nû diafirînin. Di vê heyama vala de, di vê kêlîka ku dilê min digirî, çavên min xwînê dirijînin de, dixwazim bibim gerîla, da ku biqîrim û jiyana nû biafirînim. Navê jiyana nû Rustem Cûdî ye û ronahiya cîhanê bi kulîlkên xwînê vedikin.

Di 9'ê cotmehê de, destanek bi nave Rustem Cûdî hate nivîsandin, lê dîsa jî dilê min dieşe..

Destanek, bi nave Çîçek Botan hate nivîsandin, dîsa jî dilê min dişewite.

Destanek bi navê Elîşêr Koçgirî hate nivîsandin, dîsa jî dilê min dihelike.

Dîsa jî dilê min digirî û ez di nava xwîna dîrokê de difetisim.


Hey hawaar!...

Rûşen rusen.sarili@gmail.com

Xaltîka Eyşo





## Leymun zaf çîy ra baş yena

AMED - Leymun sîr û maydanoz bikeren te mîyan û rencon bîyayîşer hol yena Leymun can dana salata salata palasyesê leymun bikeren de can dana salata Fekîyanê xo pêrça keren û leymun bikeren ser fekîyan benî orjînal leymun bikeren ser şeftalî say fekîyan benî gonê eger şima leymun bikerî mîyanê werdişera û cayê sol gena leymun Şîmitişa serdin leymun bikeren de kamî serd girot se wa leymun biwerî leymunata bivirazen. bişimen leymun nuweşîya hemenra baş yena û leymun guyn kena pak. Awîya şîrîk leymun bikeren.



# Nijadperestîya çapemenîya tirk

Wanê erdlerz bi şîdeta 7.2 de Çapêmenîya Haberturk de rojnameger Duygu Canbaş erdlerz wanê de bî ama ma hînazî xemgîn bîy. Sîteyanê înternet de vaten înşalah wa beter bîye şarê kurdan ser

Wanê de vezîr saet 13.41 de erdlerz amey meydan û şîdeta erdlerz 7.2 bî. Erdlerza pê alîkarî destpê kerd. Spîkera televîzyona Haber Turk vat kî: "Van çiqas zî rojhilate bo ma reyna zî xemgîn bîy." Û şarê kurd tepkî mojna êy nûçeyê Haber Turkî.

Çapemenîya sosyalê sîteya înternetî de nijadperestan semedê erdlerzê wanê vat kî: "Wan zî kurdê û teroristê û şarê wanî daha xirab bibo. Înşalah amede zî erdlerz bibo û şarê kurd bimro." Qezeya Colemerge Çêlî de 19 citmengî de perodayîş virazyabî û 24 leşkeran canê xo kerdî bî vînî. Heme şaristanê Tirkîya de çalakî,virazyaybî û al dalaknay bî. Çend roj bacî Qezeya Wanê Erdîşî de dewa Tabanli de şideta 7.2 erdlerz virazya û nijadperestan kerd xo vîra kî êy erdlerz bî rey homay ameya viraştişi. Nijadperestî sîteyanê înternetî de vat kî: "Kurdî heme bimrê û biqedyê înşalah daha xirab bibê." Û spîkera Televîzyona Haber Turk Duygu Canbaş zî vat kî: "Erdlerz wane ra ame ama ma hîna zî xemgîn bîy." û şarê kurd tepkî nîşanê xeberdana nijadperestan da.

Qunciknîvîskaran ena vatiş rexne kerd ema reyna zî ma wînenê kî Tirkîya verê pirsgirêka giran de ya.

**ALIKARÎ REXNE KENÎ**

Yew nijadperest sîteya nûçeya Elmadax de erdlerza pê înternetî de hemê kudan sedem alîkarî sîstede yev paşt danî yewbînan bînan.

Û nuçeya Elmadax vana ey alîkarî benî danî vaqifa PKKî qampanyaya kurdan wazenî qirap bikerî û nuçeya Elmadax alîkarîya Şaredarîya Sûrê rexnê kerden 12 Gûlanî de wanê de al PKK alaqneyen şaredarîya wanê sîteya nuçeya Elmadax ey vaten Tirkîya de hewîdar alîkarî neda şarê wanê û vanî Tirkîya de yew alîkarî esta ey zî Qizilaya Tirkana. **ENQERE-DÎHA**




## Girêdoxê PKKî û PJAKî Wanê rê alîkarî waşt

Girêdoxê PKKî û PJAKî giredoxan ra daxuyanî da. Şuney girotoxan de Denîz Kaya ard ziwan: " wa kes baye dewlet nivinerî malbata ma peran sedem cilan bidemase gerek ma bişiraw wanê yada malzeme ma bigerî bişirawê wanê PKK û PJK sedemê wanê şarê welatparêz ra vat alîkarîya Wanê bikerê. Êy zî way û birayê ma yê, ma gerek inandir alîkarî bikerin ena karê ma yo."

Tirkîya de daxuyanîya girêdoxê PKK û PJAKî Denîz Kaya ard ziwan: " Wanê de vizêrî şîdeta 7.2 de erdlerz virazya.200 kesanra zed şarê kurd canê xo kerdî vînî û zaf kesan zî bi bîrîndar û bin enqazî zaf kesan zî estîbî kesanek canê xo kerdî vînî malbatanê inarê ser weşîyê vanî û hemê kesîra şîfa wazenî."

Kaya, dewam kerd: " Ma zaf xengîn bîy û semedê ke ma giredoxî dey destê ma ra çîke nîno. Serede şarê Wanê û şarê Kurdîstanê wa bizanê ke xemgînîya erdlerzî ma bi dil û can his kenê. Wextê ke anayîn de destê ma ra çik nîno. Encax ma şaranra vanê kî alîkarîya Wanê bikerê. Merdîmê ku însanetî ya xo nêkerdo vinî ma inara vanê kî alîkarîya şarê Wanê bikerê."

Kaya veynda malbat û embazanê xo zî û vat: " Destê şima ra çi yeno se bikerê. Seredê melzemeyê ku şarê Wanê rê lazim o bişrawê û paştî bidê şarê Wanê. Malbatê ma pereyan û cilanê ku ma rê şirawenê wa bişrawê şarê Wanê rê. Kes îvey dewlete nêmano û wa şarê welatparêz nêkero xo vîra kî alîkarîya kenê goreyê înana."

Kaya peynî xeberdanê xo de vat kî: " Ma girêdoxê PKKî û PJAKî miyanê xo de peran û melzemeyan amade kenê û şirawenê şarê Wanê rê. Malbatê ma, sazîyê ma û şarê ma zî çi destê inara yeno wa bikero."**AMED-DÎHA**

## Şaredarîya Sûrê ra 3 kamyon eşya şirawit

Wanê de erdlerze de hemê kesan maxdurî ma wazenîkî şarê kurdan û hemê kesan yew bînanra alîkarî bikerîy kamî êşkenîse batonî, cilanê qalin, wa bişirawî şaredarîya Sûre ma şirawenî Wanê.

Wanê erdlerz amey meydan şîdeta erdlerz 7.2 BDP û şaredarîya Sûrê mehleda cigerayîş viraşt yardim waşt. Sedemê Wanê batonîy, cilan û gida, waşten şarê hemê alîkarî da. Paketanî yardim hemê berd şaredarîya Sûrê teslîm kerd û hemê çîy kerden zerê 3 kamyom û şirawut Wanê û wekîla şaredarîya Sûrê Nakşî Sayar sedem alîkarî ma amazî dewam keno. **AMED - DÎHA**

## HPG Dersîmê de wesayît veşna

Dersîme de HPG yew vesayît weşna sedemekê wesayît weşna vanî reyanê Êrzîncane de qontrola nasname kerden êydeya bayîya wesayît cixara berden leşkeraner wesayît weşna û şofêr azad kerd. wesayîta leşkeranra eleqeyîn bîye semede ey wesayît veşna. **DÊRSÎM - DÎHA**

## Qibrisê de êrîşê wendoxê kurdan kenîy

Şaristana Kuzey Qibrisî Lefkoşa de Zanîngeha yakin dogu de hejanperes semedê pêrodayîşê Çêle meş darfîna. Wendoxanê kurdî vanê kî canê ma tehlîkedeyo.

Şaristana Kuzey Qibrisî Lefkoşa de Zanîngeha rojhilata nezdî de hejarperes Serdar Kayaalp, Fırat Sandalcı, Talhar Sevim Ceylan, Hamdi SerenSerdar Kayaalp, Firat Sandalcı, Talhar Sevim Ceylan, Hamdi Seren 3 roj vernî de çalakî viraştebî. hejanperes erîşê wendoxanê kurdan kerd û erîş bi sîyan dewam kerd. Pêrodayîş de polêsan Serdar Kayaalp, Firat Sandalci, Talhar Sevîm Ceylan, Hemdî Seren û 21 kesî zî amey binçimkerdiş. Êy ku amey binçimkerdîş Serdar Kayaalp, Firat Sandalci, Talhar Sevîm Ceylan, Hemdî Seren bi talîmata wezîrê zerî ameybî sînorkerdiş.

Dîmay pêrodayîşî Ahmed Demîr DÎHA rê xeberî da û vat: " vizêrî zî polêsan eyşt serê key 3 embazanê ma. Wextê basqînî de semedê ku jo keyedê çinêbî binçimkerdiş nêvirazya. 4 rojî yo hejanperes û polêsî verê dibistanê ma de wendoxanê kurdan geyrenê.

Ma canê x ora şuphe kenê. Embazê ma semedê ku kurdê amey sînorkerdiş û rektorê dibistanî zî madir alîkarî nêkeno. Ma waşt kî semedê sînorkerdîşî û rektorî ma çalakîya runiştîşî virazîn encax polêsan û hejanperes dewrê dibistanî girot û nêverda ma çalakîya xo virazin. Semedê ku canê ma tehlîkedeyo ma zî fek çalakî ra verada. Ez û powîtoxê ma semedê embazanê xo û canê xo ma eyro rektorî dir xeberî danê.

Demîr dewam kerd û vat: " Embazê ma ke amey sînorkerdiş Serdar Kayaalp û Hemdî Seren şiravitê Edena, Firat Sandalci û Talhar Sevîm Ceylan zî şiravitê Stenbol. 4 hey embazê ma ke amey sînorkerdiş zi eyro şinê Enqere bi vekilanê BDP xeberî danê. **AMED-DÎHA**

## CDK: Şarê kurdan ra alîkarî wazenî

Koordînasyona civaka demokratîka kurdan a Ewropa (CDK) daxuyanî da kordînasyona kurde de vaten şarê Wanêra alîkarî bikeren felaketera wa bixelesî.

Wanê de şîdetlî erdlerz amey meydan CDK Tirkîkaya de hemê kesîyra vena alîkarîya Wanê bikeren erdlerzîya zaf kesan canê xo kerdî vînî ma hemê kesîra sersaxî vanî CDK ard ziwan ey felaketera zaf dîqat bikeren.

Çimkî erdlerzra pê 8 seat bacî kes nêamê alîkarî nekerden îlaç werdiş û şimitiş zah lazimo dewlet çîk nekerd. Erdlez de polêsan alîkarî nekerden sedemê îhtîyaca şarê Wanê Hikumat somut yew fînak nekerd. Heme rojnameger ujadê û hemê kesîy zî dîy dewlet yew çîk nekerden muhabîran zî dîy û televzîyonan de tamaşa kerd û hemêkes dîy.

Wan Erdîş û Kurdîstanê de bi hezarhey polêsan û leşkeran timûtim pê jopan û erîş viraşten ser şarê Wanê sedem demokratîk yew çalakîde. Û nîkazî kes orteda nêasînîyen ey pirsgirêkte zî mojnenêrakî dewlet dişmanatîya xo mojnara. Hûkûmeta AKP şarê kurdan rê zorbalix û zilm kerdê. Semedê êy dewletê ra alîkarî zî bê feyde bena. Şarê kurdan verê ena felaketê ra yew binan rê alîkarî bikerê. Sazîyê kurdan û malbata kurdan gerek yew bînandir alîkarî bikerî.

Kurdîstan, Tirkîya û Ewropa hemê şaran ma venenî alîkarî deja felaket ma kem kerî ey erdlerze de kamî canê xo kerdî vînîse mahemê kesan ra şîfaya xêrî wazenî ey roj roja alîkarîya şarê kurdan hemê wa yewbînan ra alîkarî bikerê. **KOLN - ANF**



Çime

Zaza Cebeli
zazacebeli@hotmail.com

## Hesasîyetê şarê kurdan

AKP bi israr ra zanayey ra îradeyê kurdan ser o kaykena. Nê kaykerdiş zî întîhar o. Serekvezîr Tayyîp efendî vano, PKK nê viraştişê çalakîyanê xo ra întîhar kena. KCK her wexti de dîyar kerd. Va ke. hesasîyetê kurdan ser o kay mekere. La mixabin hikumatê AKP nê vatişî HPG pêro peygoş kerdî. Sankî KCK vatiş ra henek kena. Medya tirkan zî bi israr ra xo kero ,lal kerd. Goş nêda hesasîyetê kurdan ser. Şerê teybetîra ajaneya xo, cerdewaneya xo ra dom kerd. Ewro zî tam gaz dom kena cerdewaneya xo.

Nê hîrê (mengî) aşmî yo ke , ser tecrîta îmralî dom beno. Operasyonê sîyasî yê qirkerdişî heme hewa ra dom keno. Tebera hînê ne sîyasetçî kurdan mendî, ne zî serekê şarederîyan. Operesyonê hewayî ü erdî tam gaz dom keno. Nê qirkerdişê îmha ü înkarî ra senîhewa hînê tehammul beno. Ewta de yewer qurbanê mişna nîyo ke , sereyê xo rano erd ,vajo bi sereyê mi birnê. Serokkomar Abdullah Gul ü serekerkanîyeya pêroyî şonê sînorê sifir nokta de mewzîyê leşkeran teftîş kenê semedê operasyonê teberî ra. Yanî ewta de dewlete kişena qirkena , her kesî bê suvalsiz sepepsiz dekena peyê beran . Heme çî dewlet ra mubah o.

La gelo şarê kuran bi tebîi ra xo pawitiş kerd se , teror beno, vehşet beno. Ewro kam dinya de veynîya yo, vajîya yo ,her roj 50 - 100 teyereyê şerî vardenê hewa kewnê heme ca bimbardiman kenê , însana, sivîlan dewan, terşo dewaran goristana. Bi des hezara rey de operasyon virazenê. Nê operasyonî , verba kamî? Verba 200 yê yew guruba HPG ra. Yanî bi însaf kamike kitabide nusneno, kamike mishebide nusneno. Ti verba yew guruba gerîla , ti heme teknolojîyanê berze bigurênê. ABD, AB, KDP YNK bîrê beyê xo paştî bigîrê. Ü ti ewro zî varde hirsê çiman birişnê.

Hirsê çimanê dayika tirka ser o zerêhîsey pîzeveşey bikere. Yanî nê hewa kamik ahlaqti esto. Ti yew Serokkamerî hawtayê mîlyona temsîl kenê. Ewti seyê kasimpaşalî nare fînenê , heyf girotiş ra behs kenê . Ti nîjadperesteyî kenê kurdan hedef nawnenê ü kuçan verpêydanê. Nê hewa qet karê aqilî ü mantiqî nîyo. Hikümatê AKP î resmen xo dano întîhar. Ne rika AKP anahewa dom bikero se , AKP temamen peynîya xo ana , xo qedênena. AKP kamik ziwan ra fam kena qet dîyar nîyo? Çalakîya navçeyê Colemerga Çelê , ser hesasîyetî ser o yew bal antiş o. Wazenê nê bal antişîra , wa fam bikerê ü fam nêkerê. HesasÎyetê şarê kurdan ser o kaykerdiş karê aqilî nîyo.

Amed de 714 rêxistînê komelê sivîlan kombiyayîş viraşt. Nê kombiyayîşte semedê çareserîya kurdan çen birîyarî girotî. Nê birîyarê rêxistinê komelê sivîlan wirdî kiştan ra zî maqûlo. Yew kinar ra çapemenîyê tirkan hindê gevezeyî kerdiş ra , wa hewna birîyarê rêxistina komele sivîan rind biwano.

# Roja veqetîn û gihîştinê

Û canê wî bangî wan kir û wî got: Ey kurên pîredayika min, seyirvanên daketin û hilketina ava deryayê. Ax ka hûn çend caran di xewnên min de li deryayan seyirîne û niha, li şiyarbûna min...

XELÎL CÎBRAN*



Almustafa, yê bijartî û hezkirî, yê di rojên xwe de berbanga gelê xwe, duwanzdeh salan li bajarê Orfaleseyê li benda keştiya xwe mabû, li benda wê keştiyê ya ku diviyabû vebigeriya û ew bi xwe re bigihanda girava lêbûna wî. Û di sala duwanzdehan de, li roja heftem ji îlonê ango meha rezçinînê, ew hilket ser zinarek li derveyî dîwarên bajar û li deryayê nêrî; û wî dît ku keştiya wî ji nav mijê dixuye. Hingê deriyên dilê wî vebûn û dilşadiya wî dûr li raserî deryayê fire firî. Û wî çavên xwe girtin û di bêdengiya giyanê xwe de lava û dua kirin.

Lê dema ew ji zinar daket, dîsan xemgînî ket dilê wî; û ew ji xwe re ponijî: Çawa dikarim bi aramî ji vir biçim bê ku hest bi xemgîniyê bikim? Na, bê ku kul bikevin dilê min, ez nikarim ji vî bajarî derbikevim. Min rojên dirêj ên têrjan di nav dîwarên kelehên vî bajarî de borandine, û şevên min ên bêkesî û tenêtiyê dirêj bûne; û ma kî dikare dev ji bêkesî û jana xwe berbide bê ku bêriya wan bike? Min gelek parçe ji giyanê xwe li van kuçe û kolanan belav kirine, bêhejmar zêde zarokên bêriya min li van zinaran rûs û pêxwas digerin û ez nikarim bê jan û bê bargiranî ji vir bifilitim û wan bihêlim. Îro ez ê perdeyê ji ser xwe ranekim lê bi destên xwe çermê laşê xwe vebirûçînim. Û ez ê ne ramanan lê dilê xwe yê tînî û birçê nerimandî li pey xwe bihêlim.

Lê dîsan jî nikarim demeke dirêj li vir bimînim. Derya, ya ku bangî hemûyan dike, gazî min jî dike, divê ez bikevim nav keştiyê. Yê hingê jî bimîne dema gav di şevê de diherikin, ew ê biqerise, bicemide û bibe qalib. Bi kêfa dilê xwe min ê her tişt ji vir bi xwe re bibira lê ez ê çawa wisan bikim? Deng nikare ziman û lêvan, ên ku bask danê, bi xwe re bibe. Divê ew bi tena serê xwe li valahiyê bigere. Û bi tenê û bê hêlîn divê baz ber bi rojê de bifire.Ku ew giha binê zinar, wî dîsan li deryayê nerî û dît ku keştiya wî nêzîk dibe. Di pîj û kepiya wê de deryavanên hevwelatiyên wî hebûn.

Û canê wî bangî wan kir, û wî got: Ey kurên pîredayika min, seyirvanên daketin û hilketina ava deryayê. Ax ka hûn çend caran di xewnên min de li deryayan seyirîne û niha, li şiyarbûna min, hûn digihin vir. Amade me ji bo çûnê, û bêriya min tenê li benda bayekî ye ku babirkên min belav bike. Dixwazim ku tenê carek din jî bîn bikim vî hewayê aram, tenê carek din jî dixwazim awirek nazenînî li pey xwe bigerînim.

Paşî ez ê di nav we de bim, ez jî deryavan di nav deryavanan de. Û tu, deryaya bêsînor, dayika bêxew, tu tenak aramî û azadî ji vî çemî û vê herikê re, tenê zivirokek din jî ev çem dixwaze bike, tenê carek din jî li vê meydanokê bixwişe. Û hingê ez ê bigihêm hembêza te, hembêza dilopek bêsînor, ya oqyanûsek bêyom.Û di dema meşa xwe de wî dît ku jin û mêran karên xwe li nav rez û zeviyan dihiştin û ber bi deriyên kela bajar de xwe dilezandin. Û wî bihîst ku navê wî li ser zimanê xelkê ye û xelk ji hevdu re ji zeviyekê ta ya din diqîrin ku keştiya wî gihaye.

Û wî ji xwe re got: Ma roja veqetîna ji hev dikare bibe roja gihîştina hev jî? Ma dikare bê gotin ku roja koça min di rastiyê de berbanga spêdeya min e? Ma dikarim ji wî, yê ku gêsinê xwe di erdê re hiştiye, yan jî ji wî, yê ku pêçke û xirxalê tirîzirviçîna xwe rawestandiye, re çi bibêjim? Ma dilê min dê bibe darek fêkîder ku fêkî bicivînim û bidim wan? Ma divê hêviya min mîna kaniyekê biherike daku bikarim îskan û qedehên wan dabigirim? Ma ez çeng û sentûr im ku destê yê bihêz li ser bigere yan jî bilûr im ku tê re bipife?

Ez lêgerê bêdengiyê me û ma min ji bêdengiyê çi gencîneyek wisa dîtiye ku bikarim wekî nihîn li wan belav bikim? Eger ev roj bi rastî jî roja rakirana dexl û danan be, ma min kîjan zevî tovandine û li kîjan bîskên jibîrbûyî? Eger bi rastî jî ev ew gav û bîsk be ku divê ez fanosa xwe hilbidim jor, çirûskek tê de be jî ne ya agirê min bi xwe ye. Fanosa min bi xwe vala û tarî ye. Govanê şevê wê dadigire û herwiha vêdixe jî.

Wî ev ramanên xwe bi gotin anîn ziman lê di dilê wî de hê gelek tiştên negotî jî man ji ber ku wî nedikarîbû berşê û veşartiyên di dilê xwe de derbibe.

Dema ew giha bajar, hemû gelî pêşwazî lê kir û, mîna ku ji yek dev be, hemû diqîrîn. Mezin û pêşiyên bajar derketin pêş û ji wî re gotin: Hê niha ji nik me neçe. Tu di tarîtî û şêlîtiya me de nîvroyek geş î û ciwaniya te hêvî daye hêviyên me.

Di nav me de tu ne biyanî û ne jî xerîb î lê kurê me yî û em pirr ji te hez dikin. Wisa neke ku em çavên bêriya rûyê te bikin.

Qeşe û qeşeneyan gotê: Wisan neke ku pêlên deryayê me ji hev biqetînin û nehêle ku salên te li vir borandî tenê bibin bîranîn. Tu mîna giyanekê di nav me de meşiyayî û sîbera te ji rûyên me re mîna ronahiyê bûye. Me pir ji te hez kiriye lê bêpeyv bû hezkirina me. Lê dîsan jî niha jiyana hezkirina me bi dengbilindî bangî te dike û xwesteka xwe derdibe. Û hezkirin, ji bilî dema veqetîna ji hev, kûratiya xwe nanase...

** Ev pasaj ji pirtûka Xelîl Cîbran a bi navê 'The Prophet-Pêxember' ji aliyê Eray Olçen ve hatiye wergerandin.*



Şop
Îkram Balekanî
zbalekani@hotmail.com

## Bixwîne, bikene û bifikire!

Ez ê hewl bidim bi du pêkenok û mînakan rewşa polîs û rewşa Artêşa Tirk raxim ber çavan. Hêvîdar im ku bi xwe nebim pêkenok.

Mînaka yekem bila ji Behlûlê Zana be. Behlûl carekê diçe taxeke din û dibe mêvan. Bi şev dereng ji dîwanxaneyê derdikeve û vedigere malê. Dema derdikeve, se yanî kûçik êrîşî wî dikin. Hêj kûçik li dûr in, ew hewl dide kevirekî rake, bavêje kûçikan û xwe biparêze. Çawa destê xwe diavêje kevir, nikare rake. Kevir bi erdê ve zeliqiye. Dibêje: "Mîratê ev çi tax e, kûçik berdane û kevir girê dane." Yanî se berdane û kevir girê dane…

Îja gava mirov bala xwe dide rayedarên Tirkiyeyê mirov dibîne ku eynî mesele ye. Polîs û leşkerê xwe berdane û li ser hev êrîş dikin. Lê tiştekî ku tu xwe pê biparêzî nemaye, tenê kevir mane; ew jî bûne sûc. Zarok keviran davêjin, dibêjin sûc e.

Ger kûçik bêne girêdan, ne hewce ye ku mirov keviran bavêje. Yanî ku se bêne girêdan kes keviran navêje…

Mînaka duyem jî dixwaz ji axayekî bidim. Du axayên kurd hebûne. Yek jîr û yek jî gêj bûye. (Balkêş e ku çawa bi gêjîtiya xwe bûye axa, ez jî nizanim, welhasil em mesela xwe nexin niqaşê…)

Axayê jîr ji xulamê xwe re dibêje; hinek fêkî li oda din amade bike, dema mêvan hatin, ez ê bêjim here sûkê ji me re fêkî bîne, tu jî zû bîne. Welhasil, mêvan tên. Axayê gundekî din tê. Yanî yê gêj. Axayê zîrek (jîr) ji xulamê xwe re dibêje, ka bazde here sûkê, ji me re fêkî bîne. Xulam radibe û dibêje hay hay, ser çavan û dikeve rê. Axa dibêje, aha, derket, solên xwe xistin pê xwe, kete rê, gihîşte sûkê, aha fêkî kirî û hat, gihîşte ber derî. Dibêje; xulam tu hatî? Xulam bersivê dide; erê ezbenî, hatim, keremke fêkî. Axayê gêj şaş dimîne. Dibêje, axa tu hefteya din mêvanê min î. Ji xulamê xwe re dibêje, qurbana xulamê xelkê bî. Te dît, xulamên xelkê çiqas jîr in. Tu jî wisa be. Dema mêvanê min hatin, ez ê bêjim here sûkê fêkî bîne, tu jî zû here bîne. Xulam jî qebûl dike.

Mêvan tên. Axayê gêj pesnê xulamê xwe dide. Dibêje welehî xulamê min gelekî jîr e. Wekî bayê ye. Bang dike xulam ka here ji sûkê ji me re hinek fêkiyê taze bîne. Xulam dibêje ser çavan ezbenî. Axayê gêj jî haşa zirtên xwe dike. Dibêje, aha solên xwe xistin pê xwe, aha kete rê, aha dibeze, aha gihîşte sûkê, aha fêkî kirî, vegeriya, aha dîsa dibeze û tê. Aha hate ber derî. Dibêje, xulam tu hatî? Xulam dibêje, na ezbenî, min hêşta pêlavên xwe nedîtine. (Na ez xulam, hêj min solên xwe peyda nekirine…)

Îja mesela medyaya tirk û artêşa wan jî wiha ye. Medya ket başûrê Kurdistanê lê artêşê hêj solên xwe nedîtine. Rojnameyan bi manşetên; aha me dorpêç kirine, me girtin, em tar û mar dikin,, kes nema, artêş kete baregahên wan, kes nema û em vê carê xilas dikin… Bi vî rengî zirt kirin û her tişt gotin. Roja din, artêşê daxuyanî da. Heta serfermandarê artêşê neçar ma ku bêje rojname derewan dikin. Got em şaş hatine famkirin. Operasyon ya hundir e, em neçûne derveyî sînor. Yanî ji axayê xwe re got, wele hêj me solên xwe nedîtine. (Wisa xuya dike wê artêş tim pêxas bimîne.)

Ma dîn bûne ku siwar herin û peya bên! Erdogan dibêje, panjehra şer û dijwariyê, mafê mirovan e. Gelo mafê mirovan girtin û kuştin e?

Di nava du salan de 8 hezar mirov hatin binçavkirin û 4 hezar kes hatin girtin. Dibe ku ev mînaka herî baş a "mafên mirovan" be…











# SEFERBERIYA WANÊ

**Li Wanê erdheja hêza wê 7.2 pêl bû bîlançoyeke gelek bi êş li pey xwe hişt. Gelê kurd ji bo birîna Wanê bipêçe ket nava seferberiyê û li her derê bû yek. Dewletê ji bo alikariyê gav ne avêt. Lê gel ji bo birîna xwe derman bike ket nav hewldanan**

Li Erdîş û Wanê zêdeyî 100 avahiyî hilweşiya. Li gundê derdorê jî gelek kesî jiyana xwe ji dest da û xesarên mezin derketin holê. Ligel evqas êş û wendahiyan xebat ji aliyê dewletê gelek kêm hate meşandin û welatiyan bi hewldanên xwe xebatên xilaskirinê meşandin. Di dema meşandina xebatan de dîmenên mirovan hestiyar dikin derketin pêş û gel birînên xwe bi xwe derman kirin.

Li Wan û navçeya wê Erdîşê ku di erdhejê de zêdeyî 100 avahî hilweşiyan û bi sedan kesî jiyana xwe ji dest dan, xebatê lêgerîn û xelaskirinê hatin meşandin. Ji ber ku 2 roj in xebat hêj didomin ji aliyê kesên ku jiyana xwe ji dest dane hejmarên bi nakok hatin bi dest xistin. Lê hat zanin ku bi sedan kes jiyana xwe ji dest dane.

### SEFERBERIYA ALÎKARIYÊ

KCD'î û BDP'iyan li gundên ku ji ber erdhejê gelek zirar dîtin jî lêkolîn kirin. Piştî li Wanê erdhej pêk hat li Amed, Colermêrg, Dersim, Riha, Bazîd û ji gelek bajarên din ji Wanê re alîkarî şandin, seferberiya alikariyê hêj didome. Her wiha li navçeya Geverê ya Colemêrgê jî 3 rojan şîn hat îlan kirin û dikanên xwe venekirin

### POLÎSAN ÊRÎŞÎ MEXDÛRAN KIR

Li Wanê daxwazên welatiyan ên li şûna ku li baxçeyê Saziya Goşt û Masiyan kon bê vedan xwestin çadiran bidin wan tê redkirin. Li bajar tenê 250 çadir hatin vedan û daxwazên welatiyan jî hate redkirin. Polîsan mudaxaleyî welatiyên ku li ber konbajar daxwazên xwe anîn ziman kir. Ji ber mudaxaleyê welatî belav bûn. Li gel daxuyaniyên Atalay ên pirsgirêka çadirê nîn e jî bi sedan kes li ber konabajar disekinin. WAN

## Felaketa mezin 'Dewlet'ê anî

Piştî erdheja li Wanê nûçeyên balkeş derdikevin. Li gorî nûçeyên malperên nûçeyan: "Dewlet pêşiyê perava Gola Wanê wek herêma felaketê îlan kir û welatî ji wir dûr xist, pişt re saziyên xwe li wê ava kir."

Wezareta Avadaniyê bi sedema tespitkirina ku 'Li gola Wanê av bilind dibe' di 1994'an de lêkolînek kir. Di wê demê 6 tax herêma felaketê hat ilan kirin. Piştî wê demê destûr nehat dayîn ku welatî li wê herêmê bimîne û hat valakirin. Lê tiştê awarte piştre dest pê dike. Li herêma ku hat xwestin welatî bên parastin saziyên dewletê hatin avakirin. Li cihê ku herêma felaketê hat ilan kirin de nexweşxane, lojman, malên mamosteyan hatin avakirin.

Her wiha hat diyar kirin ku avahiyên ku hatin avakirin jî bê destûr hatibûn avakirin.

## Dewlet li ku derê ye?

Ji hemşireyên nexweşxaneya Dewletê ya Erdîşê Eda Ekizoglu telefonî televizyona CNN Turkê kir û wiha got: " Ji sedî zêdetir mirî hene me hemûyan bir nexweşxaneyê koridorên nexweşxaneyê tije ne em ditirsin ku gav biavêjin, ji bo em pê li wan nekin me wan xist nava nexweşxaneyê. Em hewl didin ku alikariya birîndaran bikin. Alîkarî nayê. Em di nava tengasiyê de ne. Hemû kes li derve ne. Hewa pir sar e. Kon tune ne. Xwarin tune. Em nizanin ku hejmara birîndaran bû çend. Ji 3 avahiyan yek jê hilweşiya. Elektrik tune. Ambulans û malzeme heye lê cih tune."

## Ji bo Wanê seferberiya alîkariyê

Piştî li Wanê erdheja pêla 7.2 pêk hat gelek bajarên herêmê ji Wanê re alîkarî şandin. Li navçeya Geverê ya Colemêrgê jî 3 rojan şîn hat îlan kirin û dikanên xwe venekirin.

***GEVER:*** Li navçeya Geverê ya Colemêgê ji ber erdheja Wanê 3 rojan şîn îlan kir. Esnafên navçeyê ji ber hêj bi sedan welatî di bin enkazan de ne dikanên xwe venekirin. Welatî malan digerin beteniye, kon û erzaqê xwarinê kom dikin. 600 beteniye û 4 hezar nan ên teslîmî maseya qirêzê ya şaredariya Geverê hatin kirin şandin Wanê.

***DÊRSIM:*** Li Dêrsimê jî ber bi Wanê ve ekîbên alîkariyê hatin şandin. Li ser banga şaredariyê jî welatiyan 2 kamyonên erzaq kom kirin rêkirin.40 endezyarên Odeya Endezyarên Înaşatê yên Dêrsimê jî dê biçin Wanê.

***AMED:*** Piştî erdheja ku li Wanê qewimî û di encamê de bi sedan kesî jiyana xwe ji dest da ji herêmê piştevaniyên mezin didomin. Li Amedê 20 hezar betanî, hezar heb sobe ya katalîtîk, 20 kemyon kincên zivistanê, xwarin û ji bo zarokan bi hezaran pot hate komkirin. Li Amedê bi banga Şaredariya Mezin ji şev heta sibê xebat û alikariyên gel nesekinîn û encam ji aliyê Vekîlê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê Haci Haspolat ve li ber şaredariyê hate xwendin. Haspolat, da zanîn ku Serokê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê Osman Baydemîr ji bo piştgirî bide çûye Wanê. Haspolat, bilêv kir ku ekîbeke ku ji bo tendûrûstiyê ku ji 71 kesan pêk tê çuye herêma erdhêjê û dîsa xwendewanên Zaningeha Dîcleyê ku di beşa Tip û Muhendîsiyê de dixwînin jî kasî 60 kesî çûne herêmê. Haspolat wiha got, "Xwendevanên ku li Wanê dixwînin û yurdên wan xera bûne dikarin werin Amedê û em 6 otobusan dişînin Wanê. 2 mitfex, 50 tiwaleta seyyar, 6 jenerator, melzemeyên elektrîkê û projeksiyon me şand." Haspolat diyar kir ku bi xebat û alikariyên gelê Amedê jî gelek tişt kom bûne. Haspolat, tiştên ku kom bûne jî wiha vekir, "20 hezar betanî, hezar heb sobeya katalîtîk, 20 kemyon cilên zivistanê, xwarin û ji bo zarokan pot hate kom kirin û ji bo gelê me yê Wanê hate şandin"

***BAZÎD:*** Şaredariya Bazîdê û BDP'a Bazîdê jî kampanya da destpêkirin. Welatiyan gelek bataniye û cil teslîmî Şaredariya Bazîdê kirin. Tiştên hatin komkirin bi kamyona şaredariyê ji Wanê re hatin şandin. Şaredariya Bazîdê ekîba ji 30 kesan pêktê ya xilaskirinê şand Wanê.

***QILEBAN:*** Şaredariya Qilebanê jî alîkariyên ji navenda navçeyê û gundan kom kirin bi tirekê şandin Wanê. Ji bo mexdurên erdhejê ji bilî tiştên din alîkariya pere jî tê kirin.

***RIHA:*** Li navenda Rihayê hemû rêveberên BDP'ê duh êvarê li malan geriyan û banga alîkariyê kirin û serê sibehê jî welatî herikîn avahiya BDP'ê. Betanî, cilên zivistanê, zad, çadir û hwd. ên ku hatin komkirin anîn avahiya BDP'ê. Malzemeyên ku hatin berhevkirin dê îro saet di 13.00'an de bişînin Wanê.

***SERÊKANIYÊ:*** Şaredariya Serêkaniyê serê sibehê anons kir û banga alîkariyê kir. Li aliyê din bi wesayîtên seyar li gund û navenda navçeyê alîkarî têne komkirin. Welatî bi telefonan li navendên krîzê digerin û dixwazin alîkariyê bidin. Welatî eleqeyeke mezin nîşanî kampanyaya alîkariyê didin. Tiştên ku hatin komkirin dê piştî nîvro bişînin Wanê.

***WÊRANŞAR:*** Li navçeya Wêranşarê ya Rihayê jî ji bo alîkariyê bidin mexdûrên erdhejê welatî herikîn avahiya şaredariyê. Bi sedan welatî bi betanî, cil, paketên zadê hatin şaredariyê xwestin, bigîhijînin Wanê. Cigîrê Şaredar Mehmet Burun diyar kir ku ew êşa waniyan di dilê xwe de hîs dikin û ji bo gel sersaxî xwest. Burun anî ziman ku malzemeyên ku kom kirine bi ekîbeke bişînin Wanê û li wir aşxaneye ava bikin. Îro saet 13.00'an de ekîba Şaredariya Wêranşarê dê malzemeyên hatin komkirin û aşxaneyê bibin Wanê.

***PIRSÛS:*** Li navçeya Pirsûsê ya Rihayê welatiyan serê sibehê bi paketên alîkariyê hatin şaredariyê. Welatiyan xwestin malzemeyên ku anîne bişînin Wanê ji bo alîkariyê seferber bûn. Li vir jî alîkariyên ku hatin komkirin dê saet 13.00'an de bişînin Wanê.

***COLEMÊRG:*** Şaredariya Colemêrgê li bajar anons kir û di demeke kin de li 15 taxan welatiyan bersiv dan banga alîkariyê. Welatiyan bi malzemeyên alîkariyê berê xwe dan maseya krîzê. Di demeke kin de 4 hezar betanî, 6 hezar nan hatin komkirin û 3 kamyonan şandin Wanê. Rayedarên şaredariyê diyar kirin ku alîkariya wan dê bi vê yekê nemîne û ew ê alîkariyên xwe bidomînin. AMED - DÎHA

## Tirkiye 21 caran dît, lê ders jê dernexist

Li Tirkiyeyê di 80 salên dawî de heta niha 21 erdhejên mezin pêk hatin. Herî dawî 23'ê cotmehê saet di 13,41'an de erdheja hêza wê 7,2 pêl ku li Wanê pêk hat. Heta niha erdheja herî mezin di 27'ê kanûna 1939'an de li Erzînganê hêza wê 7.9 pêk hat û 32 hezar û 968 welatiyan jiyana xwe ji dest dabû. Nêzî 100 hezar kes jî birîndar bûbûn. Di erdheja li Wan û Erdîşê pêk hat de jî 217 kes mirin û 1090 kes birîndar bûn.

Li gorî daneyên Estîtuya Rasatxaneya Kandîlî ya Zanîngeha Bogazîcî, di 80 salên dawî de li Tirkiyeyê tev erdheja Wanê 21 erdhejên mezin pêk hatin. Di van erdhejan de bi sedan avahî hilweşiyan û bi 10 hezaran welatiyan jiyana xwe ji dest dan. Bi 100 hezaran welatî jî birîndar bûn. Herî dawî erdheja hêza wê 7.2 pêl li Wanê pêk hat. AMED



## Ji bo 2 hezar kesî konê xwarinê hat vekirin

Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê li Parka Zîlanê ya Erdîşê konê xwarinê veda û li vir ji bo 2 hezar kesan 3 danan xwarin bê dayîn.

Alîkariyên şaredariyên BDP'î piştî erdheja Wanê didome. Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê li Parka Zîlanê ya Erdîşê kon veda û li vî konî dê ji bo 2 hezar kesan 3 danan xwarin bê dayîn. Hevseroka Giştî ya BDP'ê Gultan Kişanak, parlamenterê Wanê Nazmî Gur û Şaredarê Bajarê Mezin a Amedê Osman Baydemîr dema xwarina nîvro de pirsgirêkên welatiyan guhdar kirin. Welatiyan diyar kirin ku rayedarên dewletê piştî erdhejê tu xebat nekirine û wan bi derfetên xwe alîkariya mexdûran kirine. WAN



## Demîrtaş: Dewlet 24 saetan li Wanê tunebû

Hevserokê Giştî yê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş ê ku piştî erdhejê çû Wanê diyar kir ku dewlet 24 saetan negîhişt Wanê û xwest hikûmet gavan bavêje.

Hevserokê Giştî yê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş têkîldarî erdheja ku li Wanê çêbû û gelek kes mirin û gelek kes jî birîndar bûn û hê jî gelek kes di bin enqazê de ye daxuyanî da. Demîrtaş li garaja Şaredariya Wanê daxuyanî da û got ku rewşa welatiyên li Wanê ne baş e. Demîrtaş anî ziman ku wan li gundan lêkolîn kirine û dîtine ku bi taybetî li gundan pêdivî bi malzemeyên jiyanê hene. Demîrtaş wiha berdewam kir: "Me li gundan dît ku mirov çiqas bêxwedî ne. Ji dewlet, hikûmet 24 saetan negîhişt Wanê. Divê felaketên xwezayê tu car nebin amûrê siyasetê. Divê her kes piştgiriyê bide Erdîş û Wanê. Heke dewlet alîkariyê bide, alîkariyên ku ji aliyê welatiyan ve tên kirin bi rehetî dikare bigîhîje gundan. Divê her kes bi histiyar be û alîkariyê bide waniyan." WAN - DÎHA



## Kongra-Gel: Êşa me mezin e divê ku em birînên xwe bikewînin

Serokê Giştî yê Kongra-Gel Remzî Kartal ji malbatên ku xizmên xwe di erdhêja Wanê de jiyana xwe ji dest dane sersaxî xwest û got ku êşa me mezin e. Kartal di axaftina xwe de diyar kir ku divê di serî de hemû şaredariyên me û hemû saziyên me di nava hestiyariyeke mezin de xwedî li gelê xwe derkeve.

Serokê Kongra-Gel Remzî Kartal di berdwamiya axaftina xwe de wiha got: "Di encama erdheja ku li Wanê pêk hatiye de gelek welatiyê me jiyana xwe ji dest dane. Bila serê gelê me sax be. Ji birîndaran jî şifayê dixwazim. Di vê pêvajoya ku dewlet li hemberî gelê me şerê topyekûn daye destpêkirin de, li Wanê erdhêjeke pêk hatiye û di encamê de gelek welatiyên me jiyana xwe ji dest dane. Êşa me gelek mezin e."

Kartal destnîşan kir ku divê gelê me bi rihên xwe yê serhildanê vê êşa xwe parve bike û di nava piştevaniyê de hêzê bidin hev û din. Kartal wiha dirêjî da axaftin xwe: "Ji ber vê yekê jî, ji bo ku ev birînên me bê kewandin divê di serî de şaredariyên me hemû saziyên me di nava piştevaniyeke mezin de xebatên xwe bimeşînin. Ji bo êşa welatiyan parve bikin û di warê aborî de jî alîkariyê bidin hev divê di nava ruhê seferberiyê de xebat bên meşandin.

Di vê esasê de em dîsa ji gelê xwe re sersaxiyê dixwazin û ji kesên birîndar re jî şifayê dixwazin." **BRUKSEL**

## Banga KNK'ê ji bo gelê Wanê


Serokatiya Konseya Rêveber ya KNK'ê balkişand ser Erdheja ku li Wanê çêbûyî divê gelê me yên li çar parçeyên Kurdistanê kire nava xemginiyeke mezin û careke din da xuya kirin ku nêzîkatiya dewleta Tirk û desthilatdariya AKPê ya li hemberî gelê kurd, bi kîndariyek faşîzan e. Pêwîst e were zanîn ku tofana li Wanê em tev kirin nava şînê û em êş û azara gelê xwe yê Wanê di kûraya dilê xwe de hîs dikin. Em, ji bo malbatên ku xizmên xwe winda kirîne ji tevahiya gelê kurd re, sersaxiyê dixwazin. Bêguman êş û azara gelê Wanê, di dilê her kurdî de bû birîneke kûr û xedar.

Serokatiya Konseya KNK'ê diyar kir ku divê tevahiya gelê kurd bi giyanê seferberiyê bikeve nava tevgera hawarî û destên alîkariyê bi riya sazî û dezgehên kurd, bi riya şaredariyên kurd, li Ewropa jî bi riya Heyva Sor a Kurdistanê bigihîne tofanzedeyan. Careke din derkete holê ku, dewleta Tirk û desthilatdariya AKPê, li hemberî êş û azara kurdan xemsar tevgeriya û bi dijminatiya tolhildanî nêzîk bû. Dewlet û desthilatdariya AKP'ê, ku di meş û bikaranîna mafên demokratîk yên gelê Kurd de, di nava nîv saetê de, bi hezaran polîs û tîmên taybet amade dike û êrîşî komên gelê kurd dike; mixabin di erdheja Wanê de, piştî 8-10 saetan çû Wanê û di rewşeke sembolîk de destê alîkariyê dirêj kir.

KNK'ê herî dawî de bang li kes û derdorên ku ligel AKP'e cih digirin û bûne parçeyek ji şerê taybet û qirêj; dive ku piştî vê bexreşiyê, rewşa xwe dibin çavan re derbas bikin û ligel gelê xwe cih bigirin. Dîsa em bang li tevahiya gelê kurd yên çar parçeyên Kurdistanê, kurdên li Ewropa, Rûsya û Ermenistanê teva dikin ku, bi hawara birayên xwe yên Wanê, navçe û gundên wê biçin. Êşa gelê Wanê parvebikin û bi alîkarî û desteka amurên jiyana rojane destekê bidin. **BRUKSEL**

# KCK'ê banga piştgiriyê kir

KCK'ê bi boneya erdheja Wanê daxuyanî da û êşa malbatên ku jiyana xwe ji dest daye parve kir. KCK'ê bangî hemû gelê kurd kir ku her kes şev û rojên xwe bikin yek, li gorî derfetên xwe alîkariya betanî, nivên, derman û hwd. bidin



Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê têkildarê erdheja bi pileya 7,2'yan li Wanê rû da û gelek kes têde jiyana xwe ji dest dan, daxuyaniyek weşand. KCK'ê ji malbatên kesên jiyana xwe ji dest dane re sersaxî û ji birîndaran re jî şîfa xwest. KCK'ê wiha got: "Em ê vê êşa gelê xwe ji nava kûrahiya dilê xwe pêdihestin û parve dikin."

Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê di daxuyaniyê de xwest ku hemû şaredar, sazî, rêxistin û hemû gel bi derfetên xwe seferber bibin. Peyama KCK'ê wiha ye; "Hate zanîn ku bi taybet li Wan û navçeya Erdîşê û hemû herêma Serhedê erdhejek bi pileya 7,3 rû daye, ev yek jî rê li ber gelek windahiyên can û mal vekiriye. Em dibêjin rehma xwedê li ser mirovên ên di vê karesata mezin de jiyana xwe ji dest dane be, ji malbat, nas û dostên wan re sersaxî û ji birîndaran re jî şîfayê dixwazin. Em ji kûrahiya dilê xwe bi vê êşa gelê xwe dihesin û parve dikin."

### DIVÊ PIŞTGIRÎ XURT BE

KCK'ê diyar kir ku êş û mexdûriyeta bi hezaran malbat û bi deh hezaran mirovan yên ji ber karesata mezin para hemû gelê kurd ê û wiha bang kir: "Em bang li gel, şarederiyên wê, sazî, rêxistinên alîkarî û piştgiriyê dikin ku bi giyanê seferberiyê û bi hemû derfetên di destê xwe de, alîkarî û piştgirî bidin. Dê rizgarkirina mirovên me yên di bin xirbeyan de, dermankirian birîndaran û ji bo vê yekê seferberkirina hemû derfetan, wê êş, birçîbûn û sermaya piştî erdhejê siviktir bike.

Ji ber wê jî dibê her kes şev û rojên xwe bikin yek, alîkariya betanî, nivên, derman û pêdiviyên sereke li gorî derfetên xwe bidin û di nava piştgiriyê de bin.

Divê gelê me li benda helwesta bêeman a dewletê nemîne, bi giyanî yekitî û fedekariyê bixebitin. Em di wê baweriyê de ne ku wê ev karesata mezin yekitî û piştgiriya di nava gelê me de xurtir bike.

Bi vê boneyê em careke din sersaxiyê ji hemû gelê me re dixwazin û em di wê baweriyê de ne ku em ê wekî gel û tevger bi awayeke serkeftî ji vê ezmûna zor rizgar bibin." **BEHDÎNAN - ANF**

## ÎHD: Bila girtiyên nexweş serbest bên berdan

Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Edeneyê bi boneya balê bikişînin ser rewşa girtiyê nexweş Latîf Badur daxuyanî dan û xwest Badûr serbest bê berdan.

ÎHD'a Edeneyê, bi boneya balê bikşîne ser rewşa girtiyên nexweş û rewşa Latîf Badur li ber Nexweşxaneya Balcali ya Zanîngeha Çukurovayê daxuyanî da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de endam û rêveberên ÎHD'ê û BDP'ê yên Edeneyê amade bûn. Di daxuyaniyê de Serokê ÎHD'a Edeneyê Aydin Sîncar, anî ziman ku mafê girtiyan ên li girtîgehê tê binpêkirin û her ku diçe tecrîd, îşkence û zextên li ser wan zêde dibin. Sîncar, anî ziman ku li gel girtiyên nexweş rewşa wan nebaş e jî dîsa rastî muameleyên keyfî yên girtîgehan tên û nayên dermankirin Sîncar, bilêv kir ku gelek girtiyên nexweş ji ber keyfiyetê ten sirgûnkirin û her ku diçe rewşa wan girantir dibe. Sîncar, da zanîn ku di 10 salên dawî de hezar û 768 girtî û hikumxwar li girtîgehan jiyana xwe ji dest dan.

Sîncar, da zanîn ku Latîf Badur 20 salin li gelek girtîgehan girtî ma û di bin şert û mercên giran de dijî. Sîncar, destnîşan kir ku ji ber şert û mercên xerab Badur bi nexweşiyên sîroz, tuberkuloz û penceşêra pişikê het. Sîncar, da zanîn ku ji ber rewşa Batur giran bû di serî de şandin Zanîngeha Dîcleyê û niha jî şandine Nexweşxaneya Balcali ya Zanîngeha Çukurovaye û rewşa wî giran e. Sîncar, xwest bi lezgîn Badur serbest bê berdan. **EDENE**

## Nûnerên Saziyên Başûr: Bila bilezgînî ev şer bi dawî bibe

Nûnerên rexistinên sivîl ên civakî yên Herêma Federal a Kurdistanê bertek nîşanê êrîş û zexten dewleta tirk dan û xwestin ev êrîş bilezgînî bi dawî bibe.

Bertêkên li dijî operasyonên leşkerî û siyasî ya dewleta tirk didomin. Nûnerên rexistinên sivîl ên civakî yên Herêma Federal ya Kurdistanê jî bertek nîşanê kiryarên dewleta tirk dan. Serokê Komeleya Agahî Komkirina ji Kes û Karên Feqîran a Germiyan Hewrê Pêşket diyar kir ku ew wekî federasyonê, kiryarên rejîma Tirkiye û rejîma Îranê şermezar dikin.

Pêşket, anî ziman ji Hikûmeta Herêma Kurdistanê dixwazin ku hikûmet ji bo rawestandina pevçûnan di nava hewldanan de be û wiha got: "Ji ber ku ev êrîş heta niha bi sedan malbatî hejarî kurd ji cih û warên xwe koçber kirine û neçarî çadiran kirin. Bi teybetî jî ew xwandevanên ku heya niha derfetê xwendina xwe nedîtine. Ji bo çareserkirinê divê hikûmet helwesta xwe nîşan bide. Divê dewleta Tirkiye û rejîma Îranê hişyar bike."

Sekreterê Federasyona li Dijî Komkujiya Kurdistanê Mamosta Wişyar jî wiha got: "Em jî bi rastî hem wekî federesyon û hem jî weke rêkxistinên sivîl li dijî hemû komkujiya nin. Em hêvîdar in ku dê pirsgirêk bi diyalog û aştiyê çareser bibe." Wişyar, da zanîn ku êdî demê komkujî nema ye bal kişand ser minakên cîhanê. Wişyar, da zanîn ku gelek welatan serî li vê rêbazê daye, lê encam bi dest nexistine." **HEWLÊR**

## Nêçîrvan Barzanî: PKK riya herî nêzî çareseriyê ye

Hatê îdiakirin ku Nêçîrvan Barzanî, roja pêncşemê di hevdîtina bi Serokwezîr û Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyê de gotibû "Pirsgirêka kurd bêyî PKK'ê çareser nabe. Eger hûn dixwazin pirsgirêkê çareser bikin, riya herî nêzî çareseriyê PKK û Ocalan e. Divê hûn bi wan re li hev bikin û ji xeynî vê, qet riyeke din ya çareseriyê serketî nabe."

Li gorî malpera rojnameya Hewlêrê, hatê îdiakirin ku nivîskar Samî Ergoşî di rojnameya Hewlêr a nêzî Nêçîrvan Barzanî de li ser têkiliyên Barzanî û Wezîrê Tirkiyeyê nivisand û îdiayên balkêş anîn ziman. Li gor îdiayan di hemû hevdîtinan de Nêçîrvan Barzanî heman helwêstên xwe yên berê dubare kirine û heman peyama berê daye wezîr û berpirsên wezareta derve û serokwezîr. Nivîskar Ergoşî anî ziman ku Barzanî gotiye pirsgirêk bê PKK'ê çareser nabe û aşkera ji wan re gotiye: "Heke hûn dixwazin pirsgirêkê çareser bikin, riya herî nêz ya çareseriyê PKK û Ocalan e. Divê hûn bi wan re li hev bikin û xeynî vê, hîç riyeke din a çareseriyê serketî nabe. Girtina siyasetvanan û xistina wan ya zîndanê ne çareserî ye. Dê encamên xirap jê derbikevin."

Nivîskar li helwêst û daxuyaniyên berê yên Nêçîrvan Barzanî yên li dor pirsa kurd wiha got: "Barzanî di hevdîtina xwe de got 'Pirsgirêk pirseke siyasî ya neteweyekê ye û PKK hebe û tune jî pirsgirêk heye û hewcedarî çareseriyê ye. Ji bo çareseriyê divê PKK li derve neyê hiştin. Tirkiye divê realîteya PKK'ê qebûl bike û deriyê Imralî veke. Pirsgirêk tenê bi riyên siyasî û rûniştin û diyaloga bi PKK'ê re çareser dibe. Çend salin şer îsbat kir ku ev metod ne çareser e. Ji bo her çareseriyeke siyasî û aştiyane, em ji her alîkariyekê re amade ne' û helwesat xwe ani ziman."

Bi salan e ku ev gotin, axavtinên Nêçîrvan Barzanî ne û di hevdîtinên pêncşema borî ya li Enqerê de jî gelek bi zelalî heman ev ziman dubare kir. **HEWLÊR**





# 'Hestên neteweyî bi riya hunerê xurtir dibin'

Hunermend Ednan Kerîm ku ev bû çendîn sal li xeribistanê jiyana xwe didomîne, herî dawî bi koma navdar a muzîka kurdî Kamkaran re albuma bi navê Xatûn derxist. Hunermend Kerîm niha li ser projeyên nû dixebite



**Kawe EMÎN** - STOCKHOLM

Ednan Kerîm niha bi Koma Kamkaran re albumeke bi navê 'Xatûn' amade kir û ji aliyê din ve hêviya vegera welat dike. Di nava stranbêjên Rojhilat û Başûr de kesê ku stranên kurmancî bi awaza herî xweş dibêje Ednan Kerîm e. Hunermend Ednan Kerîm bo Rûdawê axivî û behsa destpêkirina karê hunerî heta projeyên xwe yên dahatû kirin.

Hunermend Ednan Kerîm der barê xebattên xwe yên hunerî û jitana xwe de diyar kir ku ew di sala 1960'î de, li Kerkûkê jidayik bûye û wiha axivî: "Ji ber wê ya ku pêwendiya bavê min bi şoreşa Îlonê re hebû û li wir berpirsê duyemîn bû, piştî du salan ji Kerkûkê ew veguhastin Besre û nêzîka 6 salan li wir ma, ji wir jî tê Şarbajêr. Piştre ez, diya xwe û xûşkên xwe diçin Mawet li cem bavê min û li wir min qonaxa seretayî xwendiye. Yanî ji Kerkûk, Silêmanî, Şarbajêr û Mezinawî me".

### STRANA DESTMALÊ

Kerîm destnîşankir ku strana `Destmalê` ku ew ligel koma muzîkê ya Silêmaniyê li Bexdayê got, straneke folklorî ye û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Min bi dengê Mihemedê Mamilê lê guhdarî kiriye. Temenê min 16 sal bû, pêdiviya komê bi çend kesan hebû bo festîvala stranan li Bexdayê; dengên me test kirin. Ez di qonaxa yekemîn de biserketim.

Gava em çûne festîvalê, hunermend Kerîm Xemzeyî ku divabû ew stran bigota nehatibû. Mamoste Enwer Qeredaxî ji me re got kê dikare ji dêvla kak Kerîm ve wê stranê bêje. Min jî destê xwe bilind kir, êdî ew desthildan bû sedemê wê ya ku ez wê stranê bêjim û weke stranbêjekî pê hatim naskirin."

Kerîm kut evli mîhrîcaneke li Afrîkayê ya der barê muzîkê de jî bûbû hesttên xwe yên wê mîhrîcanê wiha anî ziman: "Ew mîhrîcan li Nairobî ya paytexta Kenyayê bû. Em birin parka Sefarî ku li seranserê cîhanê naskirî ye. Ev festîval salane tê kirin ku bi navê, lava bo avê, yanî lûbandina bo hatina baranê tê sazkirin. Ez jî yek bûm ji wan 126 hunermendên ku ji seranserê cîhanê hatibûn dawetkirin. Tiştê ku balkêş bû, ez tenê tevî ûda xwe beşdar bûm. Gava guhdariya dengê min kirin, ew kesê ku rêvebiriya festîvalê dikir, ji min re got hez dikim guhdariya straneke herêma we bikim. Min jî meqamekî xorşîd jê re got, pir bi dilê wî bû."

### MÎHRÎCANA AFRÎKAYÊ

Kerîm balkişand ser ku di wê mîhrîcanê de komî ku ji ewropayê hatibûn nasîna wan bi muzîka kurdî re hebû û wiha axivî: "Ewên ji Ewropa hatibûn muzîka kurdî nas dikirin. Lê gelek ji yên ku ji cihên din hatibûn muzîka kurdî nebihîstibûn. Xweş bû gava min bi xelkê dan naskirin weke hunermendekî Kurdistanê min binavkirin. Tiştê balkêş bû ku festîval sade bû, sehne ji giya, xwelî û qirşikan hatibû çêkirin. Bi rastî di cihê xwe de ye ku kurd şanaziyê bi koma Kamkaran bikin û bêjin ew nasnameya hunera muzîka me ne. Ev grub ewqasî mezin e ku divê Kurd weke dîrok behsa wan bikin. Kamkaran niha ji navçeya xwe hatine derve û sînorên xwe derbas kirine. Dikarim bêjim li hemû cîhanê, herî kîjan paytextê dizanin Kamkaran kî ne!

Ew şanaziyê bi muzîka kurdî û kurdbûna xwe dikin. Ev di aliyê neteweyî de, lê her çi aliyên teknîkî û hunerî ye ewqasî bilind e ku behsa wê nayê kirin. Mamoste Hoşeng Kamkar li derve xwendiye û diktora wî heye. Niha ew bûne xwendingeheke mezin û çend grubên kurdî hene ku dixwazin ji wan fêr bibin. Lewra bo min cihê şanaziyê ye ku bikarim li gel wan kar bikim."

### PROJEYÊN NÛ

Hunermend Ednan Kerîm der heqê projeya xwe ya ligel Kamkaran albumekê taybet bi helbestên mamoste Ebdulla Peşêw amade kirine. Hemû helbestên wî ne û pêşkêşî mamosteyê me yê mezin Ebdulla Peşêw dikin.

Mamoste Peşêw bi xwe jî hatibû Stockholmê, bi dengê xwe çend helbestên xwe xwendin û di CD de bicih dibin. Kamkaran herdem rêzeke taybet bo helbestvanên kurd ên naskirî, nemaze Peşêw û Şêrko Bêkes digirin. Wan carekê CDiyek pêşkêşî Elî Merdan kirin û niha jî pêşkêşî Peşêw dikin. Hunermend Kerîm niha li Swedê dijî wiha behsa jiyana xwe ya li Swedê kir: "Li welatekî weke Swêdê, xwedî berhem bi xwe berhema xwe ji te re dişîne da ku rexneyan lê bigirî û binirxînî.

Lê hinek caran li Kurdistanê gava rexneyan digirin girêdidin bi helwêsta siyasî, rexneyan digirin bo têkbirina kesayetiya mirov, rexneyan digirin bo biçûkbûna te û mezinbûna xwe, gelo ev tenê li welatê me heye yan jî li Rojhilata Navîn û welatên din heye ev mijareke din e."

### HUNERMENDÊN KERÎM

Hunermend Ednan Kerîm ku ev çendîn sal in ku bi muzîkê bilî dibe huunermendên ku jê hez dike wiha anî ziman: "Gava li Kurdistanê jî bûm, bi min xweş bû guhdariya Mihemed Arif Cezîrî, Tehsîn Teha, Hesen Cizîrî û yên din bikim. Lê gava hatim derve û yekemîn car di sala 1998ê de li Medya Tv min çend bernameyên zindî weşandin, ew bû tecrubeyeke mezin ji min re, li wir têkiliyên min li gel Kurdên bakur xurttir bûn û min guhdariya hunera wan kir. Ew hest li cem min çêbû û ji min re derket ku li Kurdistanê du cih hene: Bakur û Hewraman.

Lewra min hez kiriye çavlêkirin yan jî ew liva ku di qirika hunermendên bakur de heye dubare bikim, vêga jî pir guhdariya wan dikim, lê hê jî kêmasiyên min hene." Kerîm der barê xebatên xwe û hêviyên xwe de ev tişt gotin: "Ez her beşekî Kurdistanê weke parçekî laşê xwe dibînim. Eger destekî min Silêmanî be destê min ê din Mehabad e, eger çavekî min Qamişlo be, çavê min ê din Amed e. Huner dikare ruhê netewî bilindtir bike. Çima sînoran derbas nekim û ji Silêmaniyê neçime Amed, Dêrsim û Qamişloyê?

Ji bextê xweş heyamekê Medya Tv hebû. Vêga jî hunermendên bakur bo başûr tên vexwendin û konser ji wan re tên sazkirin. Bi baweriya min hestên netewî bi rêya hunerê zêdetir dikare xurttir bibe."

### WELATÊ XERÎBIYÊ

Ednan Kerîm der heqê welatê xeribistanê de jî hestên xwe wiha anî ziman: "Xerîbiyê ew pêwendî ji min stand ku jê re dibêjin jiyan. Li vir sibê diçî kar û êvarê vedigerî, hevalek dixwaze were ba te dema te tune yan berovajî, ev pêwendiya hişk a vir ruhê mirov dertîne. Tiştê xerîbiyê daye min, hezkirina welêt zêdetir li cem min mezin kir.

Gava mirov welatê xwe li pey xwe dihêle balansa mirov jî têk diçe û lewma biryar di cihê xwe de namînin. Vêga kurê min ê biçûk di qonaxa du yê navendî de ye, divê wê qurbaniyê bidimê heta li ser piyê xwe radiweste. Niha kur û keça min a mezin li Kurdistanê dijîn, hêviya min ew e ku vegerim û herim Jajlê li Şarbajêr, li ser parçe zeviyekî xwe gulekê biçînim, darekê biçînim, lê hinek qurbaniyên din mane divê bidim."

## Li Silêmaniyê çalakiyên hunerî geş dibin

Ber bi zivistanê ve ku sar û serma konê xwe li Kurdistana rengîn vedide de kar û xebatên hunerî yên devre ketine nava livbaziyeke ku çalakiyên xwe derxînin pêş hunerhezar. Biryar e, roja şemiyê ya bê, 2'yemîn Mîhrîcana Navdewletî ya Çanda Gelan li bajarokê Kelarê bê lidarxistin. Mîhrîcan ku ji hêla Wezareta Rewşenbîrî û Lawan a Herêma Kurdistanê û Birêveberiya Giştî ya Rewşenbîrî û Hunerî ya Silêmaniyê ve tê sazkirin, dê 3 rojan bidome û tê de 20 komên sema û dîlanê ji 12 welatan dê beşdar bin.

Birêveberê Giştî yê Rewşenbîrî û Hunerî yê Silêmaniyê Ebas Ebdilrezaq, der barê mîhrîcanê de agahî dan û diyar kir ku niha hemû amadehî qediyane û ew li benda gihîştina kom û mêvanên mîhrîcanê ne.Ebdilrezaq aşkera kir ku di mîhrîcanê de 20 komên ji 12 welatan beşdar in, ji bilî başûrê Kurdistan, Besra her yek ji Poloniya, Kuweyt, Brazîlya, Misir, Swêd, Yewnanistan, Îran û Qibrisê digel çend welatên din beşdar in. Sekreterê mîhrîcanê Hîwa Reûf jî destnîşan kir ku dê sibehê çend kom bigihîjin Silêmaniyê, ji bilîmrasîmên li Kelarê, biryar e çend pêşandan û performansên sema û dîlanê li bajar û nahiyeyên derdora Silêmaniyê û li Hewlêrê jî bêne pêşkêşkirin. Reûf diyar kir ku butceya Mîhrîcanê 250 milyon Dînarê iraqî ye.

### ŞEVA ÇÎROKAN

Li Silêmaniyê çalakiyên hunerî bi Mîhrîcana Navdewletî ya Çanda gelan ve bi sînor nîn e. Her wiha Komeleya Yekitiya Nivîskarên Kurd a Silêmaniyê şeveke ji bo çîrok, berhem û jiyana çîroknivîsê kurd ê koçkirî Muherem Mihemed Emîn li dar xist. Şeva bêhempa, li Salona Odeya Bazirganî ya Silêmaniyê di bin navê "helwest û dahênan, nemiriyê dixulqîne" de hate sazkirin. Di şevê de, Berpirsê Komeleya Yekitiya Nivîskarên Kurd a Silêmaniyê Şêrko Ebdila gotara yekitiyê xwend, piştre Cîhan Omer jiyanameya Muherem Mihemed Emîn xwend.

Her wiha di şevê de, roportajek li ser wêje û aliyên siyasî yên wî nivîskarî hate pêşandan, piştre jî her yek ji çîroknivîs Tiwana Emîn, Seba Ehmed û Karwan Elî çîrokên xwe yên taybet xwendin. Şeva ku ji bo nivîskarê kurd Muhrem Mihemed Emîn tê li dar xistin duh jî ber dewam kir. Şêrko Ebdila der barê lidarxistina şevê de agahhî dan û wiha axivî: "Armanca şevê ew e ku çîroknivîs û nifşên nû haydarî berhem û şakarên çîroknivîsê navdar ê kurd Muhrem Mihemed Emîn bin ku di rojên dijwar de xizmeteke gelek mezin ji wêje û çanda gelê kurd kiriye." Ebdila destnîşan kir ku Komeleya Yekitiya Nivîskarên Kurd a Silêmaniyê wekî erkê xwe zanî ku vê şevê li dar bixe. **SILÊMANÎ**

*Li Silêmaniyê ber bi nêzbûna zivistanê re kar û barên hunerî jî zêde bûn.*



## Di 4 beşan de xelatên hunerî bidin

Jiyaneke têr bi ked û têkoşînê, bi êş û eleman dagirtî. Nivîskarê gewre yê kurd Selah Saedil ê ku zavayê Mîr Celadet Bedirxane ango hevserê Sînemxanê ye di sala 2007'an de koça xwe ya dawî kir. Li dû xwe gelek behrem hiştin. Saedil ji bo gelê kurd di warê nivîs û hunerê de gelek cehd û xebat kir, niha jî bi malabata wî hewldanên xwe û bi alîkariya Birêveberiya Rewşenbirî û Hunerî ya bajarê Zaxoyê ve ew ê li ser navê nivîskarê hêja Saedil xelat bên dayîn.

Hat zanîn, xelateke zêrîn a salane bi navê nivîskarê navdar ê kurd Selah Saedil dê bi ser behremenên Zaxo were parvekirin. Birêveberê Rewşenbîrî û Hunerî yê bajarokê Zaxo Ferman Şukir, der barê merasîma xelatdayînê de destnîşan kir ku ev xelat ji hêla malbata nivîskar û wergêrê koçkirî Selah Saedila ve dê were parvekirin. Şukir diyar kir ku îsal dê 4 behremenên di warên wêje, stran û muzîk, şano û sînemayê yên Zaxo dê xelata Selah Saedila di 27'ê vê mehê de werbigirin.

Şukir got ku zarokekî behremend jî dê bê xelatkirin. Selah Saedila di sala 1930'yî de li Zaxoyê jidayik bûye, yek ji damezirênerên Komeleya Rewşenbîrî ya Kurdî ye li Kerkûkê ya di 1973'yan debû ye û di 1958'an de li Îngilsitanê, yekemîn pirtûka xwe ya bi navê "Kurdistan" bi zimanê îngilîz derxist.

Pirtûkên Saedila bi zimanên kurdî, erebî û îngilizî hene û her wiha dwstana Mem û Zînê jî bo zimanê îngilizî wergêrandiye. Hevjîna wî Sînem Xan keça Mîr Celadet Bedirxan e û kurekî wan bi navê Azad û keçek bi navê Dilnaz hene. Nivîskar Selah Saedila di sala 2007'an de koça dawî kir û li bajarokê Zaxo hate veşartin. **DUHOK**



## Ji YE'yê peyama zû mudaxele bikin

**BERLÎN** - Ji ber erdheja mezin a bi pileya 7,2 Wan kete rojeva cîhanê. Rayedarên Ewrûpayê gumanên xwe yên der barê windahî û xebatên rizgarkirinê yên erdheja Wanê de gotin. Piştî civîna bilind, Serokê Konseya Ewrûpayê Herman van Rompuy û Serokê Komîsyona Ewrûpayê José Manuel Barroso daxuyanî dan û ji malbatên kesên di erdhejê de jiyana xwe ji dest dane re sersaxî xwestin û ji birîndaran re jî daxwaza şîfayê kirin. Her du rêberên YE'yê daxuyaniyeke hevpar dan û gotin; 'Em êş û kederên kesên ku mirovên xwe di erdhejê de winda kirine parve dikin. Em ji rayedarên Tirk dixwazin ku mudaxeleyê di dema wê de bikin.'

## Li Tunusê tevlibûna dengdanê baş bû

**TUNUS** - Êvara roja yekşemê dengdan bidawî bû û sindoqên hilbijartinê hatin girtin. Ne li gorî hemû texmînan tevlibûna hilbijartinan gelekî zêde bû û giha ji sedî 90 ji hilbijêran dengê xwe bikar anî. Tê gotin ku partiya 'Nehda' ya islama nerm wekî ku nav lê dikin ji sedî 50 ji dengên hilbijêrên derveyî welat girtiye. Li gorî agahiyên sekreterê giştî yê lijneya serbixwe ya hilbijartinan da xuyakirin ku ji 4 milyon hilbijêrî ji sedî 90 hilbijêran dengê xwe bikar aniye. Zêdeyî 100 partî tevli pêşbirka van hilbijartinan bûne û ji ber wê yekê jî naskirina cihê hilbijêran jî gelekî zehmet bû û gelek hilbijêran cihê dengdana xwe nas nedikirin.

# Veqetîna ji artêşê pêvajoya şerê çekdar bi xwe re tîne

Li gorî çavkaniyên Sûriyeyê êdî makîneya kuştinê ne tenê li dijî xwepêşandêran li ser kare hêzên ewlekariya rejîmê xelkên li mala xwe rûniştî û girtiyên zindanan jî dikuje

NAVENDA NÛÇEYAN - AMED

Li gorî çalakvanên mafên mirovan ên Sûriyeyê hejmara kuştiyên roja yekşemê giha 22 kesan. Li bajarên Humus, Dera û navçeyên Şamê operasyonên artêşê û hêzên ewlekariyê berdewam dikin û di serdagirtinan de bi dehan kes hatine girtin.

Li gorî çavkaniyên şoreşa Sûriyeyê 11 kes li Humsê hatine kuştin û 4 kes li gundên Hemayê û 3 kes jî li nêzî Derayê her wiha 2 kes jî Idlib û 2 kes li Dûmaya Şamê hatine kuştin.

### OPERASYONA HUMSÊ


Li gorî çavkaniyên çalakbanên Sûriyeyê li hin taxên Humsê operasyonên leşkerî tên meşandin û di encama destwerdana bajêr ji alî artêşa Sûriyeyê û hêzên ewlekariyê ve gelek mal, wesayit û dikan hatine şewitandin û dûmaneke reş bi ser bajêr ketiye.

Her wiha hate ragihandin ku hêzên ewlekariyê yên ku navê Şebîha li wan tê kirin êrîşî nexweşxaneyeke Humsê kirine û gelek birîndar revandin. Her wiha li gorî agahiyên xelkê deverê êrîş bi çekên giran pêk hatiye û leşker û şebîha bi 27 wesayitan anîne bajêr.

### KUŞTIYÊN ARTÊŞÊ

Her wiha hate ragihandin ku li Derayê di pevçûnên di navbera artêşê û leşkerên veqetyayê de derdora 50 leşkerî kuştî û birîndar hene. Li gorî agahiyên rêxistina mafên mirovan li Humsê û navçeya Dareya ya Şamê 2 kesên girtî ku di zindanên rejîma Sûriyeyê de bi işkenceyê hatine kuştin teslîmî malbatên wan hatine kirin.

Li gorî ajansa fermî ya dewletê jî 6 leşker bi guleyên kesê ku navê komên çekdar li wan dike hatine kuştin.



Di destwerdana bajaran de operasyonên artêşa Sûriyeyê bênavber didomin.

### GEFA AMERÎKAYÊ

Ji aliyekî din ve endamê Konseya Amerîkayê John Makîn da xuyakirin ku mudaxeleyeke leşkerî ji bo Sûriyeyê êdî ne ji ihtîmalên dûre. Her wiha da xuyakirin ku piştî bidawîbûna operasyonên li dijî Lîbyayê êdî bêtir dê rewşa Sûriyeyê ji nû ve di ber çavan re were derbaskirin û ne dûre ku bi mudaxeleyeke leşkerî jî sivîl werin parastin. Her wiha Makîn bal kişand ser pêvajoya nû ya şoreşa Sûriyeyê û hilgirtina çekan û veqetandinên ji artêşê.

### DAXUYANIYA YE'YÊ

Serokê Yekitiya Ewropayê Herman Van Rompuy da xuyakirin ku welatên yekitiyê amade ne ku hin ambargoyên nû ji bo Sûriyeyê amade bikin. Rompuy li Brukselê derbarê bûyerên li Sûriyeyê de got ku heke tundî û zextên li ser xwepêşandêran bidawî nebe ew dê ambargoyên nû li ser Sûriyeyê ferz bikin. Berê jî Yekitiya Ewrpopayê hin ambargo li ser vî welatî ferz kiribûn wekî ambargoya li ser kirîna çekan û ambargoya li ser bankaya navendî ya Sûriyeyê. Di daxuyaniyê de bang li Beşar Esad hat kirin ku dest ji desthişlatdariyê berde .

Her wiha bang li Netewên Yekbûyî û Konseya ewlekariya hate kirin ku bi wezîfeya xwe rabin û kuştina sivîlan asteng bikin.



## Vekişîna hêzên Amerîkayê û encamên wê

Serokê Dîwana Serokatiya Herêma Kurdistanê ragihand ku vekişîna hêzên Amerîkayê, wê li ser rewşa siyasî û ewlekarî ya İraqê encamên xirab bi xwe re bînin û ew encamên xirab dê bandorê li Herêma Kurdistanê jî bikin.

Serokê Dîwana Serokatiya Herêma Kurdistanê Fûad Hûsên ji rojnameya Şerq El-Ewsed çapa Londonî re got:

"Gotûbêjên navbera Amerîka û İraqê de berdewam in. Ev gotûbêj jî du mijaran li xwe digirin, ya yekemîn vekişîna hêzên Amerîka ye û ya duyemîn jî dana mafên dest nedanê ye bo rahênerên Amerîkî piştî vekişîna hêzên Amerîka yên ku li İraqê bimînin."

Fûad Hûsên wiha axifî: "Em li benda encamên dawî yên wan hevdîtinan in. Em ê piştre helwesta xwe ya fermî li ser wan hemû mijaran diyar bikin."

Berî niha jî serkirdayetiya siyasî ya Kurd tirsa xwe li ser vekişîna hêzên Amerîka ji İraqê nîşan dabû. Bi taybet jî bandorên xirab ên ser proseya navçeyên cihê nakokiyan.

### ESAD RED KIR

Ji aliyekî din ve Serokê Dîwana Serokatiya Herêma Kurdistanê Fuad Hûsên piştrast kir ku ji aliyê Serokê Sûriyê Beşar Esad ve dawetnameyeke fermî ji Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî re hatiye şandin da serdana Sûriyê bike, ''lê neçû.''

Fuad Hûsên da zanîn ku haya Serokatiya Herêma Kurdistanê ji bûyerên niha yên Sûriyê heye û got: ''saet bi saet em dişopînin. Herwiha Herêma Kurdistanê rolekî girîng dîtiye di veguhertina bîrûra, rûniştin û gotûbêjan de ligel serkirdeyên siyasî yên Kurdê Sûriyê.''

Her di çarçoveya vê mijarê de Husên, piştrast kir ku çend meh berî niha dawetnameyeke fermî ji aliyê Serokê Sûriyê Beşar Esad ve ji Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî re hatiye şandin da wek Serokê Herêma Kurdistanê serdana wî welatî bike.'' Hûsên wiha axifî: 'Rast e dawetname hatibû, lê Barzanî serdana Sûriyê nekir.

Ne rewşa Sûriyê baş e û ne jî vê gavê rewşa Herêmê lewra j3i ew dawetname di wê pêvajoyê de nehate pejirandin. Li gorî çavdêrên siyasî Esad xwestiye bi wê bangê hin aliyên kurd razî bike da ku li dijî rejîma wî tevli xwepêşandanan nebin. **HEWLÊR**

## Xwepêşanderên tirk li Holanda 5 kurd birîndar kirin

Hêjmarek xwepêşanderên Tirk li Amsterdamê êrişî baregeha navendek rewşenbîrî ya Kurdên li Amsterdamê kirin û di encamê de 5 kes birîndar bûn.

Roja (23.10.2011) nêzîka 200 xwepêşanderên tirk berê xwe dan baregeha Navenda Kurdî ya li Amsterdamê û hewldan ku biçin hundir. Piştî ku ji aliyê Kurdên di nava baregehê de pêşiya wan hat girtin, tirkan baregeh dan ber beran û piştre jî dengê çend gûleyan di nava xwepêşanderên tirk de hat bihîstin.

Li gorî şahidê bûyerê, piştî zêdetirî 20 otomobîlên polîsên Holanda hatin û nêzîka 100 polîs li navçeyê belav bûn, rewş hat kontrolkirin.

Xwepêşanderên tirk piştî nîvroya heman rojê, li navenda bajarê Amsterdamê li hemberî êrîşa gêrîllayên Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) ya li navçeya Çelê, nerazîbûn nîşan dan.

Nûçegihanê Rûdawê ragihand ku saet 15.00'an grûbek xwepêşanderên tirk ber bi baregeha Navenda Kurdî ya li Amsterdamê ve birêketin û hewl dan ku biçin nav baregehê. Polîsên trafîkê rêya çûn û hatinê li taxa mezin a Sloterkade qedexe kir û rê neda ku otomobîl biçin û bên. Herwiha rê nehat dayîn ku nûçegihanên çapemeniya Holanda û biyanî nêzî cihê bûyerê bibin.

Jinek ciwan bû li gel Rûdawê diaxivî û ji ber qerebalixiya di nava baregehê de nekarî biaxive. Lê ew yek eşkere kir ku "Zêdetirî 200 kurd di nava baregehê de ne û bi parêzvanîkirina baregehê ve mijûl bûn."

Li gor zanyariyên Rûdawê, heta saet 21.00'ê şeva 23.10.2011an hêjmara xwepêşanderên tirk ên ji aliyê polîsan ve hatin girtin 5 kes bûn. Herwiha di nava baregehê de jî 2 kes hatin girtin.

Tevî ku ti zanyariyên piştrast li ber destan nîne, lê li gor zanyariyên nûçegihanê Rûdawê 5 Kurd ji sedemê ber avêtin û gule berdana tirkan birîndar bûne û şandine nexweşxaneyê.

Kanala navxwe ya AT5 a bajarê Amsterdamê bi xwe dispêre çavkaniyên cihê baweriyê yên polîsan û dibêje: "Piştî bûyerê bi dehan Kurd ji bajarên cuda yên Holanda ber bi Amsterdamê ve bi rêketine. Polîs ji bo kontrolkirina rewşê di nava hewldanên berdewam de ne." **AMESTERDAM**

## XAÇEPIRS


**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1 -** Mektûb... Dolbenda tenik a ku jin didin serê xwe **2 -** Beşeke malê, jûr... Mija ku li asîman berî baranan komî ser hev dibe û jê baran dibare... Notayek **3 -** Bajarekî Tirkiyeyê... Bi rûsî erê **4 -** Cînavka pirhejmariyê ya xwerû... Notayek... Paytexta Perûyê **5 -** Alif, xwarina sewalan... Bêqiloç **6 -** Postê gurandî... Notayek **7 -** Mehek... Kurteya ajansa nûçeyan a Dîcleyê **8 -** Diravê ku ji aliyê dewletê ve ji welatiyan tê wergirtin... Daçekek ku wateyê xurt dike... Yekeya giraniyê ku li Fransayê 30,59 gr û li Îngilistanê jî 28,349 gr û li Holandayê jî 100 gr ye **9 -** Rojek... Nexweşîneke çerm e ku bi taybetî di gewde, çîm û rû de wekî kelepotkan xwe dide nîşan... Pirsek di rewşa tewandî de **10 -** Xwarina ku xwêya wê zêde ye... Xweliya piştî şewatê

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1 -** Tûj... Cînavka şexsê sêyemîn ji bo rewşa netewandî... Cihê herî kûr ê okyanûsan û devera ku tîrêjên rojê nagihîjinê **2 -** Li gorî baweriyên olî mirovê ku ewilî ji layê Xwedê ve hatiye afirandin û pêxemberê pêşîn... Xwarinên ji şîr **3 -** Di dîrokê de dewleteke kurdan... Kurteya elementa Aktînyûmê **4 -** Rengek... Hejmarên du, çar, şeş, heyşt û hwd. **5 -** Cephe, bere... Dijbera jêr **6 -** Cînavka vegerok... Cihê ku ka lê tê berhevkirin **7 -** Agir... Newaya nivandina zarokan... Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyeyê **8 -** Êsîr... Baneşana ku pê ga tê ajotin û sekinandin **9 -** Bajarekî me... Zimanê gelê Danîmarkayê **10 -** Cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya; li ku ye?... Sedemkarê tevgerê, paldêr... Hejmarek

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 | 10 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | T | V | ■ | X | Î | Ç | ■ | X | E | ■ |
| 2 | R | E | S | E | N | ■ | M | A | W | E |
| 3 | ■ | B | O | Z | ■ | S | A | L | ■ | T |
| 4 | P | Ê | R | A | R | ■ | T | ■ | A | Ê |
| 5 | A | J | ■ | L | E | H | ■ | A | R | ■ |
| 6 | R | ■ | A | ■ | N | ■ | C | U | D | Î |
| 7 | ■ | S | A | L | Î | S | E | ■ | Û | ■ |
| 8 | K | A | ■ | A | ■ | O | N | S | ■ | Ê |
| 9 | A | R | D | ■ | A | L | Î | ■ | A | D |
| 10 | N | ■ | O | J | E | ■ | N | E | V | Î |





# HPG: Geliyê Kazanê senaryo ye

HPG'ê angaştên rayedarên tirk û çapemeniyê yên wekî "Piştî operasyona Çelê gelek gerîla hatin kuştin" derewand. HPG'ê diyar kir ku Geliyê Kazanê jî "senaryo ye" û Artêşa Tirk piştî çalakiya Çelê sînor derbas nekiriye

Fermandariya Biryargeha Navendî ya HPG'ê diyar kir ku îdiayên piştî çalakiya Çelê yên wekî ku dibêjin gelek gerîla hatine kuştin ne rast in. HPG'ê daxuyand ku operasyona Geliyê Kazanê jî "senaryo ye" û bal kişand ku di dema çalakiya Çelê de jî sînorê başûrê Kurdistanê nehatiye bikaranîn.

Fermandariya Biryargeha Navendî ya HPG'ê di daxuyaniya xwe de got;"Piştî çalakiya Tevgera Şoreşger a Şehîd Çîçek ya li Çelê ku di encamê de gelek leşker û polîs hatibûn kuştin û ji bo tolhildana hevalên me yên şehîd ketine Rustem, Çîçek, Alîşêr û yên din hatibû lidarxistin gelek mijarên derew tên nîqaşkirin û lîstikên qirêj tên plankirin."

HPG'ê diyar kir ku di dema çalakiya Çelê û pevçûnên piştî wê de bi giştî 7 hevalên gerîlayan jiyana xwe ji dest daye û bi dehan leşker û polîs hatin kuştin û ji bilî vê, li herêma ku wekî Geliyê Kazanê tê binavkirin tu windahiyên wan tune ne. HPG'ê da zanîn ku hemû çalakiyên wan di nava sînorê bakurê Kurdistanê de hatine birêxistinkirin û pêkanîn û wiha hate gotin: "Ji bo tesîra çalakiyê kêm bikin û kapasiteya hêza şer a gerîlayan bikin mijara nîqaşê derewek wekî "Ji başûrê Kurdistanê" êrîş dikin hatiye belavkirin. Ev li hemberî dewlata dagirker û kedxwar çalakiyek parastinê bû. Me bi tu awayî di dema vê çalakiyê de sînorê başûrê Kurdistanê bi kar neaniye."




HPG'ê daxuyanad ku piştî çalakiya Çelê bi destê çapemeniyê şerê taybet li hemberî kurdan kampanyaya lîncê hatiye birêxistinkirin û di serî de Xarpêt û gelek bajarên tirkan, kurd rastî hewldanên lincê hatine û wiha hateg gotin: "Em li hemberî van hewldanên lîncê dewleta T.C'ê şiyar dikin. Ev çalakî ji ber helwesta wan a dagirker hatiye lidarxistin. Li hemberî gelê me, tekane li hemberî kurdekî hewldana lincê pêk were, bila baş bê zanîn ku em ê bersivek tundtir bidin nîşandan." HPG'Ê got divê gelê kurd êdî mekanîzmayên xweparastinê çalak bike û tedbîrên xwe bigire û li taxên ku kurd lê dijîn xwe bi rêxistin bikin û piştgriyê bidin hevdu û li hemberî êrîşên polîsan û hêzên nijadperest di nava helwesta xweparastinê de bersiv bidin êrîşan. HPG'ê bangî ciwanan kir bila tevli refên gerîla bibin. Di daxuyaniya HPG'ê de wiha hate gotin: "Rayedarên dewletê çalakiya me ku li hemberî êrîşên li dijî Rêberê me, gelê me û gerîlayan wekî bersivek hatiye lidarxistin wekî 'Hovîtî' pênase dikin. Em stûyê xwe li hemberî dewleta ku şer îlan kiriye xwar nakin. Li hemberî êrîşan gerîlayên me mafê xweparastinê bi kar anîne. Li gel vê derdorên ku bombaran û gerîlayên şehîd ketine nabînin û herî dawî li hemberî kuştina sivîlên li Qendîlê bêdengiya xwe diparêzin daxuyaniyên pêkenok û pûç didin." HPG'ê da zanîn ku Artêşa Tirk heta neha ji sînorê başûrê Kurdistanê de derbas nebûye û wekî HPG di teyakuzê de ne û li hemberî hemû tiştê amade ne. HPG'ê bangî gel kir ku bila bi awayekî xurt xwedî li cenazeyên gerîlayên di dema Operasyona Şehîd Çîçek de şehîd ketine derbikevin. **BEHDÎNAN - ANF**

### HPG: 15 leşker hatin kuştin

***Hate ragihandin ku*** di encama çalakiyê gerîlayên HPG'ê yên li Colemêrg, Sêrt û Bedlîsê de bi giştî 15 leşker hatine kuştin. Hate diyarkirin ku li Bedlîsê gerîlayek jiyana xwe ji dest da.

Navenda Çapemenî-Ragihandin HPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku di encama çalakiyên gerîlayan de li Bedlîsê 6, li Sêrtê 5 û li Colemêrgê 4, bi giştî 15 leşker hatine kuştin. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku gerîlayek li Bedlîsê jiyana xwe ji dest daye. **BEHDÎNAN - ANF**

## Lînca li hemberî kurdan berdewam dike

Piştî daxuyaniyên rayedarên dewletê, serokwezîr û AKP'iyan û çapemeniya tirk êrîşên lincê yên li hember gelê kurd zêdebûn. Polîsên navçeya Umraniyeya Stenbolê, bi hinceta biryara walîtiyê heye, destûrê nadin ku kes biçe avahiya BDP'ê ya navçeya Umraniyê. Li Antalyayê komeke nijadperest li ber çavên polîsan bi keviran êrîşî avahiya BDP'ê kirin.

Di demên dawî de êrîşên li dijî avahiyên BDP'ê zêde dibin. Herî dawî li navçeya Umraniye ya Stenbolê li dijî avahiya BDP'ê ya Umraniyê ku 4 endamên Meclisa BDP'ê bi tevahî 20 kes hebûn, rastî êrîşa komek ulkucu hat. Piştî vê bûyerê polîsên navçeya Umraniyê destûr nadin ku kes biçe rêxistina BDP'êya Umraniyê. Polîsan li ber avahiya BDP'ê barîkat danî û bi sedema biryara Walîtiyê heye, destûr nade ku kes biçe avahiya BDP'ê. Hate zanîn ku rayedarên Midûriyeta Polîsan a Umraniyê li BDP'iyan geriyane û bi hinceta 'ulkucuyan tahrîk dikin' ji BDP'iyan xwestin ku lambayên avahiyê vemirînin. Polîsan îro destûr neda ku rêveberên BDP'ê jî biçin avahiyê û astengiya polîsan a ketina BDP'ê berdewam dike.

Li navçeya Alanyayê ya Antalyayê komeke nijadperest a ku bi peşengiya Ocaxên Ulukcuyan hatin ba hev bi keviran êrîşî avahiya BDP'ê kirin. Polîsan ewil tedbîr girtin lê piştre dev jê berdan û nijadperestan jî êrîşî avahiya BDP'ê kirin. Koma nijadperest heta êvarê li ber avahiya partiyê ma û heqeret li kurdan kirin û slogan avêtin. Daxwaza hevdîtinê ya BDP'iyan a bi polîsan re bê muxatab ma û hate hînbûn ku li navçeyê hin rajnameyên herêmî jî van koma texrîk dike û bingeha provokasyonê ava dike.

Li Bursayê nûçegahanê DÎHA'yê Çagdaş Erdogan ê ku ulkucuyên meşiyan avahiya BDP'ê dikişand kamarayê, piştîku polîsan ew nîşan da û got "Ez ê de bi îşaretekê lînc bikim" rastî êrîşa koma ulkucuyan hat. Êrîşkarên bi dirûşmên "Li vî PKK'î bidin" êrîş nûçegahanê me kirin. Nûçegîhanê me bi zorê xwe ji nava destê ulkucuyan rizgar kir.

Daxuyaniyên hikûmetê yên piştî bûyera li navçeya Çelê pêk hat êrîşên li dijî BDP'ê zêde bûn. Komek ulkucu yên li Qada Bajar ya Bursayê kom bûn, ber bi avahiya BDP'ê ya bajar re meşiyan. Komek ulkucu ketin avahiyê, polîsekî fermî derket ser bane avahiye Ala Tirk daliqand. Endamên Partiya Kedê ya (EMEP) avahiya xwe ya qatek li bin BDP'ê ye di hundir de asê man. Koma ulkucu ya ku demekî direj avahî îşgal kirin piştre derketin derve, ber bi avahiye dirûşme berz kirin.



**ANTALYA / STENBOL / BURSA - DÎHA**

## Bi sansurê lînc dikin!

Zeynep KURAY - STENBOL

Çapemeniya tirk di van rojên dawiyê de biryar da ku nûçeyên der barê êrîşên nijadperestan ên li ser avahiyên BDP'ê de çêneke. Li gelek navçeyên Stenbolê li dijî avahiyên BDP û kurdan êrîş pêk tên; lê ajansên nûçeyan ên tirk yên wekî AA, DHA, ANKA, CÎHAN, ÎHA bi hev re biryar dane ku van bûyerane nekin nûçe. Sansurkirina nûçeyên lîncê piştî hevdîtina rojnameger û Tayîp Erdogan zêde bûn.

Bi alîkarî û piştgiriya polîsên Tirk, avahiyên BDP'ê yên li navçeyên Uskudar, Bagcilar, Esenyûrt ên Stenbolê li rastî êrişên faşîstên Tirk hatin. Êrişen herî dijwar li ser avahiyên BDP'ê yên li Bagcilar û Esenyûrtê hatin. Kurdên li Esenyûrtê bi êrişen polîs û nijadperestan re rû bi rû man.

### POLÎS JÎ ÊRÎŞ DIKE

Polîsan qet dest nedan êrişkaran, li ser hev bombeyên gazê avêtin avahiya BDP'ê. Bi heman awayî avahiya BDP'ê ya li Bagcilarê û Navenda Çand û Hunerê ya Med di seat 13.00' li rastî êrişên nijadperestan û bombeyên gazê yên polîsan hatin. Dema me xwest em bikevin hindurê avahiya BDP'ê ya li Uskudarê ya li rastî êrişê hat, polîsên li ber derî bûn nehiştin. Ji ber wê jî Serokê BDP'a Uskudarê Ferît Yalçin ji jora avahiyê hate xwar û nerazîbûn nîşanî polîsan da.Jixwe tişta balkêş ew bû ku dema êriş pêk dihatin, polîsan bi bêtêlan anons dikirin, agahî ji gelek nûçegihan û rojnamegeran re diçû, lê dîsa jî tu kes nedihatin cihê bûyerê.

### NÛÇEGIHAN MIKUR HAT

Tenê nûçegihanek ji Ajansa Nûçeyan a Cîhanê hate cihê bûyerê û got ku wana (çapemeniya tirk) bi hev re biryar daye ku van bûyerane nekin nûçe. Xebatkarek ji CÎHAN'ê li xwe mikûr hat ku wana biryar daye ku wêneyên êrişên li ser avahiyên BDP'ê û kurdan nekişînin û nûçeyên wan çênebkin. Xebatkarê CÎHAN'ê bersiv neda pirsa "We çima biryarek wiha da?" a nûçegihana ANF'ê. **ANF**

## Saziyên civakî: Li şûna nifir û tolê aştî

Nûnerên ÎHD, MAZLUM-DER û TÎHV'ê li ÎHD'a Stenbolê der barê geşedanên dawî, daxuyaniyên Serokwezîr Erdogan û Serokomar Abdullah Gul en wekî "Em ê tolê hilînin û bersîv bidin" de, nerazîbûnên xwe anîn ziman. Parazvanên mafên mirovan diyar kirin ku ew li şûna nifrîn û tolê aştiyê dixwazin.

Di civine de li ser navê parazvanên mafên mirovan Serokê ÎHD'a Stenbolê Prz. Abdulbakî Boga, daxuyanî xwend û berî her tiştî ji malbat û xizmên kesên di erdheja li Wanê jiyana xwe ji dest daye re sersaxî xwest. Boga, bang li her kesî kir û bi ruhê seferberiye tev bigerin û alîkariyê ji mexdûrên erdhejê re bişînin. Boga, bal kişand ser buyera li Çelê û geşedanên piştî wê û wiha got: "Daxuyaniyên Serokwezîr Erdogan Serokomar Abdullah Gul bi daxuyaniyê 'Tolhildanê' û 'Bersivandinê' nêzîk dibin û gele kurd û BDP kirine hedefa xwe. Ji ber vêyekê êrîşên lincê yên li dijî gelê kurd alozî û rageşî zêde dibe. Ev xizmeta aştiyê nake." **STENBOL**

## Li Amedê bi sedan kes çûn konê şînê

Polîsan destûr nedan meşa ku ji bo endamên Konseya Rêveber a KCK'ê û Konseya Leşkerî ya HPG'ê ku di êrîşa hewayî jiyana xwe ji dest dan. Li gel astengiyan girse kom bi kom li kolanên cuda çûn konê şînê.

Gelek welatî û Hevserokên BDP'a Amedê Zubeyde Zumrut û Omer Onen jî di nav de li ber BDP'a Rezan kom bûn, polîsan avahî dorpêç kir. Polîs heta cihê ku welatî kom bûn hatin û nehîştin welatî kom bibin û bi panzer û TOMA'yan qad dorpêç kirin. Ligel hişyariyên polîsan welatiyan bi israr xwestin bimeşin û BDP'î bi polîsan re hevdîtin pêk anîn. Piştî hevdîtinê Zubeyde Zumrut daxuyanî da û got ku wan ji ber erdheja Wanê meş betal kirine û ew ê ber bi konê şînê ya Mala Şînê ya Badikayê ji bo HPG'iyan hate vekirin bimeşin.

Piştre girse ber bi cadeya Barişê ve dest bi meşê kir û polîsan demeke ji bo destûrê bidin an jî nedin di teredutê de man. Piştre pêşiya welatiyan girtin û welatî jî li hemberî helwesta polîsan li kolanan belav bûn û kom bi kom bi ber bi mala şînê ve meşiyan. Ligel astengiyan welatî gîhiştin Mala Şînê ya Badikayê.

Welatiyên ku li Mala Şînê ya Badikayê hatin ba hev wêneyên endamên Konseya Rêveber a KCK'ê Rustem Cudî, Endamên Konseya Leşkerî ya HPG'ê Çîçek Botan û Alîşer Koçgîrî jî di nav de yên 7 endamên HPG'ê û posterên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û alên KCK'ê daliqandin û dua kirin. **AMED**

## Ji TEVDEM'ê banga tevlibûna merasîma li Helebê

Bi boneya xwedîlêderketin Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Rustem Cûdî, Endamên Konseya Leşkerî ya HPG'ê Çîçek Botan û Alîşêr Koçgirî yên di êrîşa hewayî de jiyana xwe ji dest dane, li Helebê merasîmek tê lidarxistin. Tevgera Civaka Demoratîk(TEVDEM) banga beşdarbûna merasîmê li gelê kurd kir.


Li bajarê Helebê li taxa Şêx Meqsûd Xerbî li rex qehweya Cemîl Horo ku herî dawî li wir Komîn hatibû sazkirin, ji bo Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Rustem Cûdî û endamê Meclusa HPG'ê merasîmek ji aliyê TEVDEM'ê ve tê lidarxistin. Merasîm bi dirûşma 'Şehîd rêberê têkoşîna me ne, Em xwedî li şehîdan derbikevin' tê lidarxistin. TEVDEM'ê bang li gelê kurd û hemû gelên ku li Helebê dijîn kir ku beşdarî merasîmê bibin. Cihê wê merasîm lê bê lidarxistin; Heleb- Taxa Şêx Meqsûd Xerbî li qada ku Komîn lê hatiye sazkirin, li rex Qehweya Cemîl Horo. Merasîm wê îro, saet 16.00an de, bê lidarxistin.

Li girtîgeha bajarê Helebê yê Sûriyeyê girtiyên ji doza PKK'ê û PYD'ê ji bo êrîşên dawî li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê şermezar kirin û ji bo Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Rustem Cûdî û hevalên wî yên ku di êrîşan de jiyana xwe ji dest dane, greva birçîbûnê li dar xistin. **HELEB**

# Hiyerarşiyê civak ji cewhera wê dûr xist

Hiyerarşî wekî têgîn tê wateya 'rêveberiya pîroz.' Pîremêrê bi ezmûn bi Şaman re tifaqê datîne û bi vî awayî pêvajoyeke nû destpê dike. Têgihîştina otorîteyê ya di wê pêvajoya dest pê dike êdî ne têgihîştina jin-dayikê ye

**ARÎN SARÎNA**



Civaka hiyerarşîk, serdemeke ku civaka exlaqî û polîtîk wekî cewher û formê civakî yê sereke hebûna xwe berdewam dike û di kêleka wê de jî serdestiya baviksalarî dixwaze wekî sîstemekê xwe rêxistin bike îfade dike. Tê texmîn kirin ku ew serdema dîrokî di navbera salên BZ 6000 û BZ 4000 de hatiye jiyîn. Mirov dikare wê serdemê di heman demê de wekî pêvajoya kaos jî bi nav bike. Di wê rawestgeha dîrokî de sîstema jindayikê ya ku xwe dispêre civaka exlaqî û polîtîk dikarî xwe nû bike û ji wê merhelê derbikeve. Bi vê yekê dikarî ji nû ve bibe sîstema sereke. Lê ji wê neqeba kaos sîstema koledar û dewletparêz bi serkeftî derket.

Di serê qadên ku hiyerarşî tê de pêşket Mezopotamyaya jêrîn tê. Di vê mijarê de belgeyên di dest de didin nîşandayîn ku di pêşketina hiyerarşiyê de çanda El-Ubeyd xwedî karaktereke xuyaker e. Çanda El-Ubeyd çanda şivantiyê ye. Di navbera salên BZ 5000 û BZ 3500 de xwe gihandiye astekê ku bikaribe bandoreke neyînî li ser derdora xwe bike. Ji ber vê yekê jî mirov dikare bibêje civakên Semîtîk di pêşketina hiyerarşiyê de roleke sereke lîstine.

**'RÊVEBERIYA PÎROZ'**

Hiyerarşî wekî têgîn tê wateya 'rêveberiya pîroz.' Pîremêrê bi ezmûn bi Şaman re tifaqê di deyne û bi vî awayî pêvajoyeke nû destpê dike. Têgihîştina otorîteyê ya di wê pêvajoya dest pê dike êdî ne têgihîştina otorîteya serdema sîstema jin-dayikê ye. Bi her tiştê xwe têgihîştineke otorîteyê ya nû ye. Ji ber ku şefê eskerî jî digrin nav xwe û pêvajoya ber bi dewletê ve diçe didin destpê kirin.

Otorîte û çanda li derdora jin-dayikê pêş dikeve, ji ber taybetmendiyên jin dayikê yên wekî zayîn, parastin, xwedîkirin, parvekirin û hwd. bi gîrêdayîneke mezin tê pêşwazîkirin. Ev rewş bi gotina Rêbertî, dibe çavkaniya dîrokî ya têgîna "dayik" jî. "Ji ber ku dayik di şert û mercên herî zehmet de dizê û xwedî dike. Di vî warî de jî xwediyê roleke sereke ye. Bêguman, hiyarerşî, otorîte û çanda li ser vî hîmî pêk bê, wê girêdan û dilsoziyeke mezin bibîne.Têgîna "dayikê" ji ber vê yekê, heta îro wekî bingehê hebûna civakê bi hêz hatiye û wekî din îzaha vê rastiyê nîne. Wekî ku yeqîn tê kirin, hurmet û rêza ji dayikê re bi sedema taybetiya wê ya zayînê nîne. Hewce ye dayik, wekî rastiya civakî ya herî girîng û têgîna 'dayika xwedawend' were fêmkirin. Deriyên wê li rastiya dewletê girtî ne û hemû taybetiyên ku rê nadin dewletê di himbêza xwe de dihewîne."

**PÊŞKETINA QURNAZIYÊ**

Hal bû ku otorîteya nû ya ku ji aliyê mêrê qurnaz û bi hêz ve hate pêşxistin, her ku çû ber bi çînbûyîn û dewletbûyînê ve rengê xwe guherî. Me li jorê gotibû ku civakbûyîn li derdora jinê pêşket. Ev rewş di wateyekê de heya astekê dûrbûyîna mêran ji wê civakîbûyînê îfade dike. ketina mêr a di nav wê civakîbûyînê de di çarçova pîvanên ku ji aliyê jin-dayikê ve hatine diyar kirin de pêk tê. Mêrên ku jin-dayik wana baş û kêrhatî didît, di xiste nava vê civakbûnê de. Wê ev paşê rê li ber hesûdiya mêrên din veke.

Dê ev, wekî nakokiyekî piştre veguhere çavkaniya pirsgirekeke girîng. Zarokên kur piştî heta demeke diyar di nava civakbûna jinê de dimîne şûnde, wexta hate temeneke guncav êdî rê dikin nava mêran. Mêrên ku di koxikên ji rêzê de jiyan dikin ango nîv hovîtiyê de jiyana xwe di domînin heta vê demê jî di maneyeke civakî de ji avakirina çandekî dûr in.

Ji ber vê yekê her ku mêr pergala xwe ya malê saz kir, dikeve nava afirandina çandeke xweserê xwe jî. Beriya vêya mirov wê nikare behsa çandbûnekî xweserê mêr bike. Lê mirov dikare bêje di nava pergala malê ya jin-dayik afirandiye de beşdarî çêkirina çandê bûye. Lê dîsa jî mirov nikare li vir behsa çandeke taybetbûyî ya xweserê jin û mêr bike. Her nirxeke tê afirandin berhemeke hevpar ya civakê ye. Wexta ku em di vî alî de lê dinerin, mirov dikare bêje hemû nirxên çandî yên madî û manewî ku di nava vê pergala malê ango ya kedî de hatine bi dest xistin, berhema hevpar ya jin û mêr e.

**JIYANEK BI HEVSENGÎ**

Heta vê pêvajoya me behsa wê kir ne rewşeke jinê ne jî ya mêr li ser hev emirwarî û tehekûm çêbike, nîn e. Dibe ku em bi hevokeke ji Bookchîn bigirin re ev rastî baştir were fêhm kirin. "Di qonaxa destpêkê ya pêşketinên civakî de çandên ku jin û mêr afirandine hev temam kirine û aşkera ye ku ji bo aheng û yekparebûna civakê amûrên pêwîst ên jiyanê bi hevre çêkirine ango dabîn kirine. Ev her du çand bi hevre ne di nava pevçûnê de ne. Eger ji çandeke xwe dispêrin nasnameya cinsî li hember yê/ya din rewşeke emirwarî yan jî dijminî çêbûba, hema hema ne gengaz bû ku komên mirovan yên dema destpêkê bikarin xwe li ser piya bigirin. Ji bo komên mirovan di nava ew şertên xwezayî yên pir zehmet û talûke de jiyana xwe bi domînin, neçarbûn ku eger serî misqalek jî îhtîmala dijminahiyekî di nava têkelên li wir de hebe, bi rêya rêzdariyekê ku bikare hevsengiyekî di nava wan de bide çêkirin, pergaleke civakê dihate sazkirin."

Otorîteya ku xwe li ser esasê ji holê rakirina hev temamkirina civakî bilind kir, wekî otorîteyeke şexsî pêşdikeve. Bi daneyên ku di dest de hene tê îsbat kirin ku otorîteya hiyerarşîk ku di çarçoveya vê tifaqê de pêşdikeve re derdora jinê tê vale kirin û digihije pergaleke malê. Her wiha tê zanîn ku ev otorîte di destpêkê de li ser mêrên ciwan hatiya pêşxistin. Û em pir bi hêsanî dikarin bêjin ku ev jî li ser esasê propagandeyeke dijber ya pir mezin a li dijî pergala dayikê ya kedî hatiye pêşxistin. Ji ber wê zehmet nebe ku em bêjin ji xeynî vêya şensê xwe yê pêşketinê hebû. Xisletên kesayetî yên wek qurnazî, hîle û derew ku jêdera xwe ji çanda nêçîrvaniyê digire, mîsoger e ku mêr ê bihêz wê serî li riyeke wiha bixe.

**PERGALA MALÊ**

Em dibînin ku di mêrê qurnaz û bihêz de hêdî hêdî kamil bûn çêbûye. Ango tifaqa sê alî her ku diçe pergala xwe çêdike. Pergala ku çêkiriye jî pergaleke malê ye. Di derdora ev pergala malê de civakbûna xwe saz dike. Pergaleke malê ku bixwe li ser hikûm bike, dixe dewrê. Ango dest ji jiyana xwe ya nîv hovî ya di koxikan de ber dide û dest bi sazkirina pergala malê dike. Du xisletên esasî yên pîr (kal) bûnê heye. Ya yekemîn wekî fizîkî bêhêziye; ya duyem jî zanabûn û gihaştîbûna dispêre ezmûnan. Ji bo pîre mêr ya yekemîn eger lewaziyek ango qelsiyek be, ya duyem jî tê maneya hêzê. Yanê ji bo ya yekemîn bixe hevsengekî û ew aliyê xwe yê lewaz veşêre, wê aliyê xwe yê duyemîn ku zanabûn û ezmûnin bixwaze bikar bîne. Bicih hatina vêya di pratîkê de wiha ye; pîre mêr ciwanan li derdora xwe kom dike û zanabûna xwe ya heyî dide wan. Yanê di rastiyê de bi ragihandina ezmûnên xwe ji ciwanan re wana di derdora xwede di civîne. Bi vî awayî ji hêza fizîkî ya ciwanan jî sûd wer digire.

**XWEBIHÊZKIRIN**

Mêrê bihêz û qurnaz ku di zimanê siyasî de wekî jerontokrasiyê tê terîf kirin, ev şêweyê otorîteyê ku pîre mêr ciwanan bi xistina bin bandora xwe re hêz bidest dixe. Her wiha bi ezmûna ku di encama pîrbûnê de hatiye girtin re dibe navendeke hêzê. Wekî jêdera hêzê jî dînamîzma ciwanan ya fizîkî bikar tîne. Pêwîstiya ciwanan ya bi ezmûnan dibe sedem ku werin vêya. Jerontokrasî wekî çandeke desthilatiyê îro jî ji aliyê sîstema şaristaniyê ve yek ji wan rêbazên herî tê bikaranîne. Ji bo dînamîzma ciwanan di nava sîstemê de bigire ango ciwan dernekevin derveyî sîstemê hemû rêk û rêbaz di ceribîne. Di serî vana de jî bi rêya Seks, Huner û Sporê ku em wekî polîtîka 3-5 terîf dikin re, divê ciwanan bêhiş bikin û di nava sîstema dewletparêz de ji bûyîna talûke derbixînin, tê.

Ligel van jî di serî de saziyên perwerdeyê dibin, bi bikaranîna hemû amûrên ragihandin û gihaniyê re îdeolojiyên wek cinsiyetparêzîneteweparêziyê û hwd. di nava ciwanan de belav dikin. Bi vî awayî jî heqîqet di asteyeke mezin de tê manîpulasyon kirin û wekî hêzeke herî esasî ya civakî ciwanan jî di rewşeke nikaribin desthilatdaran di lêpirsînêre derbas bikin, çêdibe. Bi vê ciwan wekî encama şovenîzmê timî di rewşeke ku bikar bînin de digirin. Jêdera hemu polîtîkayên ku ciwanan wekî amûreke bikaranînê dest digirin û li gorî wê jî siyasetê pêşdixînin, sîstemeke xwe dispêre serdema hiyerarşiyê.

## Li Amedê Konferansa 'Bihara Ereban û Kurdistana Sûriyeyê'

**RIZOYÊ XERZÎ**




Bi pêşengiya BDP, HAK-PAR, KADEP, TEVKURD, OSP, Tevgera Şoreşgerên Demokratên Kurd, Koma Dialogê ya Dîcle û Firatê de Konferansa bi navê "Bihara Ereban û Kurdistana Sûriyeyê" li Amedê hate lidaxistin. Lê mixabin hundirê wê vikî vala bû û hin kesan ew ji xwe re kir wekî panelekê.

Bi rastî dema mirov navê konferansê û mijara we ya piştgiriyê dibîne ji bo mirov gelekî balkêş tê. Balkêş e ji ber ku bûyerên germ li wî parçeyê welat diqewimin û kurd di pêvajoyeke gelekî giring re derbas dibin û hewcedariya wan bi piştgiriya kurdên parçeyên din heye. Lê mixabin gelek kêmaniyên vê Konferansê hebûn û li şûna ku behsa rewşa kurdên li wî parçeyî dijîn bê kirin bêtir hinekan ji xwe re kir cihê fitne û fesadiyên xwe û hinekan din jî konferans kir wekî panela ji bo danasîna xwe.

**QENCIYÊN BINXETIYAN**

Destpêka vê civînê pir germ û xweş derbas bû dema ku şaredarê Amedê Osman baydemir peymaneke hestiyar û germ û tijî hestên neteweyî yên paqij dest bi vê konferansê bû.

Baydemîr,di axaftina xwe de wiha got: "Li hemû qadên cîhanê dawiya zilmê nîne. Kê zilm li cîhanê kiribe, ew zilmdar hemû têkçûne. Ez hêvîdarim ku wê dem were li Rojhilata Navîn jî dîktator û desthilatdariya zilmê têk biçe." Baydemîr li ser wekhevî û biratiya kurdan rawestiya û pêde çû: Baydemîr, got ku keda kurdên binxetê li ser hemû kurdên serxetê heye û wiha got: Her ku serê yekî ji me êşiyaye me xwe avêtiye Binxetê. wiha axivî: "Lazim e em dijminatiya hev nekin, bila dijmin li ser tifaqa me nebe dijmin.

Lê piştî wê mêvanên ku ji Sûriyeyê hatibûn dest biaxaftina xwe kirin lê mixabin. Li şûna ku di axaftina xwe de behsa rewşa Sûriyeyê ya niha û rewşa kurdan û pêwîst e ji bo yekitiyê çi bê kirin bikin, wan behsa hin zext û zorên dîrokî ên li ser kurdan kirin ku her kes wan dizane. Behsa kembera erebî û mehrûmkirina kurdan ji gelek mafên wan hate kirin lê rewşa niha ya kurdan nehate kirin û gelekî bê amadebûn hatibûn vê Konferansê. Xwezî mêvanên konferansê yên ku ji Binxetê hatibûn bêtir bi amadebûn û têr û tijî tevli vê konferansê bûbûna wê wateyeke din a vê komcivînê hebûna.

**KONFERANS BÛ PANELA VAROJ**

Bi her halî axaftina wan çiqasî bê amadebûn û qels be jî dihate daqurtandin lê tiştê ku bi carekê nedihate daqurtandin paşê bi axaftian Seîd Varoj û Ibrahîm Guçlu dest pê kir. Varoj derkete ser dikê û bi qasî hemû mêvanên Konferansê axivî, bi rastî jî bi qasî hemû kesên ku axaftin kirin dem ji wî re hate veqetandin û gotareke dirêj pêşkêş kir ku di navê re gelek kes ji konferansê derketin derve. Bi rastî li şûna Konferansa kurdê Sûriyeyê bû panela Seîd Varoj û tevî hişyariya organîzatorê panelê jî wî gotara xwe kurt nekir û heta dawî berdewam kir.

**HELWESTA GUÇLU**

Paşê jî dawî di beşa pirs û bersivan de wekî ku di hemû panel û civînan de pêwîrek Ibrahîm Guçlu heye dîsa ew pêwîra xwe pêk anî û kampanyaya xwe an jî peywira xwe ya reşkirina PKK'ê li wir jî kir. Li şûna tiştekî ku xizmeta yekitiya kurdan bike dîsa fitne û fesadiyek kir û hewldana sabotekirina nêzîkaya partiyên kurd ên Sûriyeyê kir. Guçlu dibêje: Çima PYD li Sûriyeyê di çalakiyan de sloganên li dijî hikûmeta tirk û Erdogan dibêjin. Ji xwe Guçlu ji we bêtir dizane ku alîgirên PKK'ê bi milyonan li her çar parçeyên welat hene û dema bûyerek çêdibe li her çar aliyan çalakî tên lidarxistin û nerazîbûnên xwe tînin ziman, lewra jî normal e ku li Binxetê hin çalakiyên wiha werin lidarxistin. Lê mesele ne ew mesele peywir û helwesta vî mirovî ye, li şûna ku hewl bide di konferanseke wiha de kurdan nêzî hev bike ew hewl dide ku nakokiyan biafirîne. Bi her hal ji xwe ji roja min navê mirovî mirovî bihîstiye di hemû çalakiyên ku tevli bibe mijar çi dibe bila bibe peywîra wî heman peywir e şerê tevgera azadîxwaz a gelê kurd e.

Bêguman lidarxistina konferanseke wiha li Amedê gelekî hêja û watedar e lê mixabin ne ji alî tevlibûnê ne jî ji alî naverokê ve nikaribû bibe bersiva pêwîst û naverokek dagirtî û bi sûd lê dibe ku bibe gava yekemîn ji bo lidarxistina konferanseke têr û tijî.



# Bêrîtan xeta azadiyê ye

Bêrîtan (Gulnaz Karataş) ronahiya jiyana azad û pêşenga têkoşîna jinan bû. Bêrîtan li hember dagirkeriya dijmin çalakiyeke fedaîtî kir û di ser çalakiyê re 19 sal derbas bûn dîsa jî Bêrîtan di dilê her kurdekî de dijî

**Zerya CILO** - BEHDÎNAN



Bêrîtan (Gulnaz Karataş) bi eslê xwe ji Dêrsimê ye. Ew di sala 1971'an de li Solhanê ji dayik bûye. Heta ku biçe zanîngehê li Elezîzê dijî. Piştre ji bo zanîngehê diçe Stenbolê.

Salên 1990'î li Kurdistanê salên bi agir bûn. Ev agir di dilê hemû kesên ku digotin "ez Kurdekî bi rûmet im" de vêdiket. Her wiha agir herî baş li çiya vêdikeve. Xweşikbûna Cûdiyê wê jî kişand. Piştî Cûdiyê derbasî Geliyê Azadiyê bû. Li vir çû kampa şervanên nû. Piştî demekê di bihara 1992'yan de bi heyecaneke mezin dixwaze derbasî pratîkê bibe. Lê ew ji bo çapemeniyê tê peywirdarkirin. Dilê wê îsyan dike, lê li hemberî vê yekê dernakeve.

Di sala 1992'yan de nokeriya kurdan bi tevê neyarên kurd dest bi êrîşê kir. Ji ber vê yekê gelek şervan şehîd ketin. Bêrîtan jî tevli şer û pevçûnan dibe. Di pevçûnan de gelek hevalên wê şehîd ketibûn. Hestên wê tevlihev bûn. Bi hêrs bû. Bi taybetî jî li hemberî îxanetkarên kurd pir bi hêrs bû. Ev kurdên çawa bûn, çawa dixwestin darbeyê li şerê azadiya kurdan bixin? Ji ber vê yekê li ber çavên wê ji dijmin xirabtir bûn. Di dilê xwe de li hemberî îxanetê hêrsa ku ji pola mezin dikir. Dê tu caran teslîm nebûna. Ji ber ew hîn bibû ku her tim bedela jiyanê heye. Ji ber vê yekê jî pêşengtiya şoreşê kir.

**BI TÎPÊN ZÊRÎN NIVÎSÎ**

Bêrîtan Hêvî di 25'ê cotmeha 1992'an de, di şerê başûrê Kurdistanê de ku Artêşa Tirk û PDK'ê di heman eniyê de li hemberî PKK'ê şer dikirin de, têdikoşe û heta fîşeka xwe ya dawî pevçûnên dijwar didomîne. Piştî ku fîşekên wê diqedin çeka xwe dişkîne û ji bo dîl neyê girtin xwe ji latên bilind diavêje û xeta fedaîtiyê pêşdixe. Bêrîtan bi vê yekê û sekna xwe pêşengtiyê ji jina kurd re dike. Bêrîtan her tim li hemberî desthilatdariyê têkoşîn kiriye.

Di têkoşîna azadiyê de bi lehengtiyek pir mezin pêşengtî dikir û têdikoşiya. Evîna dilê heval Bêrîtan her tim çiyayên Kurdistanê bûn tu kesî nedikarî wê ji vê têkoşîna bi rûmet û bi nirx cuda bike.

Bêrîtan bi vê çalakiya xwe ya fedaîtiyê dibe sembola ji bo têkoşîna jinên kurd, ger ku îro tevgerek azadiyê ya jinê heye bisaya hevela Bêrîtan çêbûye. Bêrîtan cihê xwe di dilê hemû gelê kurd û jinên kurd de çêkiriye. Bêrîtan li hemberî koletî, înkar, îmha û biçûk dîtin û li hember zîhniyeta kevne perest tu caran qebûl nedikir û tu caran jî tawîz nedida zîhniyeta feodal ya ku dixwast jinê kole bihêle têdikoşiya. Bi vê sekna xwe ya qehreman navê xwe bi tîpên zêrîn nivîsî.

**BI HEZARAN BÊRÎTAN**

Ji ber dijmin xwestiye gelê kurd wek gelekî nas neke, nezanbe, xwe nasneke, kolebihêle, îmha û înkar bike ev jî bi lehengiya Bêrîtan têk çû. Polîtîkaya dewleta tirk û PDK li hemberî vê çalakiya Fedaîtî hemû tiştên wan ji binî de têkçûn û Bêrîtan ji bûna jina kurd berxwedanek da destpê kirin îro jin bi saya vê têkoşînê jin xwe naskir xwedî li têkoşîna azadiyê derket û bi hezaran jinên ciwan li peyşopa Bêrîtanê li çiyayên Kurdistanê têkoşînê dikin. Gelê Başûr jî bi vê çalakiya Bêrîtanê bi bandor dibin û piştî vê gelek kesan navên keçên xwe kirin Bêrîtan. Niha bi hezaran Bêrîtan li çiyayên Kurdistan li bajarên kurdan dijîn û têkoşînê dikin.

Bêrîtan kesayeta jin a xweser, zana û rêxistin kiriye. Divê hemû jin bigiyana Bêrîtan û çanda ku li dû xwe hiştiye bi hişyarî tevbigerin û pê şoreşa xwe ji polîtîka û hesabên dagirkeran û desthilatdarên li ser Kurdistanê re nehêle. **ANF**

## Feraseta hikûmeta AKP'ê ya li hemberî zarokan


Serokwezîrê tirkiyeyê Receb Tayîb Erdogan ku di her fersedekê de û her cihê ku diçe gotina xwe ya ku dibêje " 3 zarokan çêbikin" li ser vê pêşniyarê tu bergîdank negirt. Navenda nifûsa sîstema îdarî TUÎK 'ya MERNÎSÊ li gorî îstatîstîka sala 2009'an 1 milyon 254 hezar û 946 bebek hatine cihanê, ev hejmar di 2010'an de dakete 1 milyaon 238 hezar û 970.

Di programa MERNÎS Saziya îstatîstîkê ya tirkiyeyê di 2001 an de wekî vekirî ( online) pêk hat, di îstatîstîkên welidînê de ev tebana daneyê serkeftîbû. Di saya Programê de herdem zanîn dihatin nûkirin, li cihê îkametgeha dayikê tê diyar kirin. Li gorî vê yekê jî di sala 2009 an de 1 milyaon 254 hezar û 946 bebek ji dayikbûne, ev hejmar di sala 2010'an de 1 milyon 238 hezar û 970 hat xwarê. Yanî hejmra bebekên ku di salekê de ji dayikbûne jî 15 hezar û 976 kêmbûye. Li gorî vê îstatîstîkê di sala 2009'an de hêza welidînê 17,4 bû, di 2010'an de daketiye 17 yê.

Li gorî îstatîstîkan di sala 2010'an de welidînê ya herî zêde li herêmên başûrê Rojhilat û Anadoliyê 27,3 hezar bebek çêdibin, herêma herî kêm jî li rojavayê Marmarayê 11,4'e. wek din tê gotin ku komên ku welidîn dibin jî emrê wan di navbera 15-44 de ye 'Hiza giştî ya welidînê' di 2009' an de hezar 72,9 di 2010'an de jî ji hezarê dakete 71,5'ê.

Di programa MERNÎS'ê de her wiha hat diyar kirin ku li ser banga Erdogan ya ku digot " herî kêm 3 zarokan çêbikin" ev ji aliyê welatiyan ve tu bergîdank negirtiye. **ÎZMÎR - DÎHA**

# SERSAXÎ



Rustem Cûdî



Çiçek Botan



Alîşêr Koçgirî

**ji bo bîranîna 7 rêhevalan...**

*Bila bibişkive ev hêvî*
*Li ser rûyen dîrokê*
*Bila nû bibe*
*Dem û demsal*
*Hêvî bila bes bimire*

*Û bisekine ew reşa dil*
*Bi ser kesera cergê de*
*Bila neçilmise hestên delal*
*Bi ser xemgînî û melûliya*
*Xweda...*

**Li ser navê hevalên wan ên girtîgeha Elbistanê; Îsmaîl Tuzun, Yucel Balyecî, Ridvan Er, Mehmet Yoldaş, Şafî Yildirim û Nîhat Ekmez**

## Rêwîtiya ber bi cîhana jinê ve

Komeleya Şehrazat a jinan daxwaz dike ku bi hunerê cîhana jinê biguhere. Reyhan Zeran bang li jinan kir ku " werin em bi hev re, helbest, çîrok û jiyana xwe raxin ser kaxizê."

Li bajarê Hamburgê ya Almanyayê komeleya Şahrazat a Transçand huner û komeleya jinê hate damezirand.

Reyhah Zeran bal kişand ser xebatên hunerî û wiha got: "Me 9 jinên ku ji xebatên cur bi cur li bajarê Hamburgê yên komeleya Şahrazat a Transçand, huner û çandê armanc dike ku destkeftiyên nû bi dest bixin. Endama Komeleya Şahrazat a Transçand, hunerê Reyhan Zeran destnîşan kir ku wan dest bi xebatên du meh carekê yan sê meh carekê li taxa partiya Sol a Hamburgê li avahiya Alton hatine ba hev û da diyarkirin ku xebatên wan dê ji bo huner û helbestan berdewam dikin. Zeran, diyar kir ku wan di adara sala 2010'an de li gel jinên hunerhezker hatine ba hev, ew li ser bingeha hunera civakî ku pêk bînîn nîqaş kir. Zeran, da zanîn ku sedemê avakirinê di serî de ew e ku jin bên cem hev û ruhê huneriyê derxin û vê bi jinan re parve bikin. Zeran, bilêv kir ku armanca me ew e ku ew xebatên ku ew dikin û cîhana jinan birengînin.

**RÊXISTINA JINAN**

Zeran, diyar kir ku jinên ku li bajarê Hamburgê dijîn dixwazin bi helbest, çîrok, serpêhatî, wêne û helbestan çêdikin di nava xwe de bibînin. Divê jin di nava xebatên hunerî de cih bigire û fikra azad derxin holê. Jinên Aktivîstên Komeleyê dixwazin xebateke bi navê " Çîrokên me hêj nehatiye nivîsîn" bixin jiyanê. Aktivîstên Komelê nivîsek bi navê "Li ser rûpelek vala tiştên ku di ruhê me de derbas dibûn kê nedixwest binivîse" yanî her kes dikare fêr bibe. Her wiha jinan bang li jinên ku li Hamburgê dijîn jî tevli vê xebatê bibin.

**RÛYÊ JINA KOÇBER**

Komeleya jinan a Şahrazat a Transçand, huner û Komela jina di 8'ê Adarê, 25 Mijdarê de di cîhana jinê de wê şahiyên ji koçeriya 50 salan û dibin navê "Koçeriya di rûyê jinê de" wê çîrok bên vegotin, her wiha dê di şeva ku helbest bên gotin de jî xebat bên meşandin. Her wiha Wê di 28'ê kanûnê de jî li avahiya Alton Werkstattê û li sê navendên cuda şevbê kirin û her kesê ku tevli bibe dikare li ser jiyana xwe çîrokan vebêje. **HAMBURG**

